ziman

CELADET ALÎ BEDIR-XAN

Elfabêya kurdî & Bingehên gramera kurdmancî

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

Elfabêya kurdî &
Bingehên gramera kurdmancî

Elfabêya kurdî &
Bingehên gramera kurdmancî

CELADET ALÎ BEDIR-XAN

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

Celadet Alî Bedir-Xan: Elfabêya kurdî & Bingehên gramera kurdmancî

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Celadet Alî Bedir-Xan, Arif Zêrevan û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-04-3

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

nêverok

Pêşgotin **7**

I. Elfabêya kurdî 11

Esas û bingehên elfabêyê **13**
Dengdar **16**
Dengdêr **24**
Nisbeta herfên kurdî **33**

II. Bingehên gramera kurdmancî 37

Rêmanên berpêşkî **37**

Gramêr **37**

Zmanê kurdmancî **37**

Hêmanên zmên **37**

Tîp **37**
Tîpên zmanê kurdmancî 37
Dengdayiya tîpan 38
Dengdêr 38
Dengdar 38
Doma dengdêran 38
Xweseriya hin dengdêran 39
Tîpa dubare 42

Kît **43**

Bêje **44**

Birên qisetê **44**
Guhêrbarî 45

Vekît **46**

Niqteşanî 47
Niqte 47
Niqtepirs 47
Niqtebang 48
Niqtecot 48
Niqtebihnok 48
Bihnok 48
Rewes û vêsih 48
Kevanek 48
Dunik 49
Xêzek 49
Bendek 49

Navdêr 51
Hevenav û serenav 51
Hevenav 51
Serenav 51
Guhêrbariya navdêran 51
Zayendê nêr 52
Zayendê mê 52
Wezîfeyên navdêrê 53

Mêjer 55
Yekejmar 55
Gelejmar 55
Gelejmariya serenavan 56

Tewang 57
Tewanga navdêran 57
Bireserê navdêrê 61

Veqetandek 62
Veqetandekên binavkirî 62
Veqetandek di pêşiya rengdêran de 63
Veqetandekên nebinavkirî 63
Veqetandekên nebinavkirî di pêşiya rengdêran de 66
Tewanga veqetandekê 67

Pronav 71
Zayendê pronavan 71
Pronavên nêr 71
Pronavên mê 71
Pronavên nêtar 71

Pronavên kesîn **72**
Pronavên kirar **73**
Pronavên bireser **76**
Pronava berbihevîn **77**
Pronavên lihevxistî **79**
Pronavên işarkî **81**
Pronavên girêkî **83**
Pronavên pirsiyarkî **84**
Pronavên nebinavkirî **86**
Pronavên xwemalîn **87**

Rengdêr **89**
Rengdêrên wesfîn **90**
Dereceyên rengdêrên wesfîn 91
Rengdêrên işarkî **93**
Rengdêrên jmarîn **94**
Rengdêrên pirsiyarkî **95**
Rengdêrên nebinavkirî **95**
Rengdêrên xwemalîn **95**

Jmarnav **97**
Jmarnavên binavkirî **97**
Tewanga jmarnavan **98**
Qeyda gelemper 98
Nîv 98
Yek 99
Hezar 100

III. Servehî

Trajediya tirkîfîzebûyiyan û
minaqeşeya li ser »i« û »î«-ya kurdiyê **103**
Denganiya zimanê kurdî 103
Windabûna »i«-ya bêniqte û prosesa xwendinê 105
Hêsanî an zehmet 109
Font, Internet û teknîk 111

Pêşgotin

Mîr Celadet Alî Bedir-Xan (1893–1951) mîrê kirmanciya modern e. Bi xêra wî, kirmanciya îro, ta dereceyekê, gihaye qunaxekê ko mirov dikare jê re bibêje qunaxa wekêkiya kirmanciya nivîskî.

Heger mîr Celadet Alî Bedir-Xanî di nîvê pêşiyê yê vê sedsalê de, bi zanîn û mahirî, elfabeyeka serast û lihevhatî danemezirandiya dê kirmanciya nivîskî di bin xeter û tevliheviyê de bûya û nedigiha qunaxa pêşketî ya îro.

Jinûveçapkirina *Elfabêya kurdî* û *Bingehên gramera kurdmancî* ji ber sê binasan giring e: 1) naskirin û fêrbûna elfabeya kurdiyê ko mîr Celadet Alî Bedir-Xanî bingehên wê danîne, 2) rêlibergirtina dijminên elfabeyê û 3) fêrbûna gramera kirmancî bi ravekên kirmancî.

Ji vê kitêba di destên we de diyar dibe ka mîr Celadet Alî Bedir-Xan di damezirandina elfabeya kurdiyê de çiqas sexbîr û mahirê karê xwe bûye. Wî gelek ziman û elfabeyên biyanî dizanîn û ew bi hemî zanîna xwe serdest û raserê denganiya zimanê kurdî bû. Mîr Celadet Alî Bedir-Xan ji 14 salan pirtir li ser elfabeya kurdiyê xebitiye û ew li gor denganiya zimanê kurdî edilandiye. Wî dengên hemî zaravayên kurdiyê baş nas dikirin û baş dizanî ka çi birha (tehsîra) denganiya zimanên biyanî li denganiya kurdiyê bûye.

Bo nimûne ew di elfabeya kurdiyê de dengê »u«-yê wekî dengekê biyanî dide zanîn û bi ravekên bereqil izbat dike ko di kurdiyê de eslê wî dengî »wi« ye, yanî eslê bêjeya »kirmanc«-ê »kwirmanc« e, lêbelê paşê ev deng, »wi«, li hinek deveran nêzîkî êk bûne û bûne »u« yanî »kurmanc«, li hinek deverên dî jî »w« ketiye û »i« maye, yanî »kirmanc«.

Herwiha mîr Celadet Alî Bedir-Xan bi dûr û dirêjî li ser dengê »i« û »î«-ya kurdiyê rawestaye û gotiye ka çima wî ev deng bi van herfan nîşan kirine.

Di van salên dawiyê de hinek kurd dijayetiya herfên »i« û »î«-yê dikin û dibêjin em van herfan bikin wekî yên tirkan. Gava ko xwendevan vê kitêbê bixwînin dê bibînin ko ti bingeh ji dijayetiya wan kesan re nîne.

Bi minasebeta vê minaqeşeyê min jî nivîsareka dirêj nivîsandiye û ew di dawiya vê kitêbê de wekî servehî çap kiriye.

Mîr Celadet Alî Bedir-Xanî elfabeya kurdiyê parçe-parçe di »Hawarê« de weşandiye û paşê jî ew wekî kitêbok derêxistiye. Piştî ko wî elfabeya kurdiyê wekî kitêbok derêxistî jî hinek parçeyên dî di »Hawarê« de weşandine.

Ev kitêba di destên we de ji hemî parçeyên ko di »Hawarê« de hatine weşandin pêk têt. Di dawiya parçeya 15-ê de (»Hawar«, hjm. 23) wî »dûmahîk heye« nivîsandiye lêbelê min li ti deveran ew »dûmahîk« nedît.

Parçeyên elfabeya kurdiyê di van hejmarên »Hawarê« de hatine weşandin: 1–12, 17–18 û 23

Herwiha mîr Celadet Alî Bedir-Xanî »Bingehên gramera kurdmancî« jî parçe-parçe di van hejmarên »Hawarê« de weşandiye: 27–35, 37, 40, 42–48, 50–51 û 53–54

Heta niho gelek kitêbên gramera kirmaciyê hatine nivîsandin lêbelê hertim ew bi hinek zimanên dî hatine rave kirin. »Bingehên gramera kurdmancî« kitêba pêşiyê ye ko ravekên wê jî bi kurdî ne. Ji lewra em dikarin bibêjin ko mîr Celadet Alî Bedir-Xan di vê rêyê de jî pêşengê me ye û her û her emê minetdarên wî bin.

Wekî ko xwendevan dê ferq bikin »Bingehên gramera kurdmancî« ne timam e, hemî beşên gramerê tê de nînin. Bo nimûne beşa lêkeran, ya hokeran, ya daçekan, ya hevoksaziyê û hinek beşên dî jê kêm in. Digel vê jî kitêb bi serê xwe şaheserek e û divêt li ber destê hemî kurdên xwendekar û zimanzan hebe.

Jixwe gramera kamil ya kirmancî, paşê, ji aliyê Roger Lescotî ve bi ravekên fransî hatiye çap kirin. Ew berhem (*Grammaire kurde – dialecte kurmandji*) berhema mîr Celadet Alî Bedir-Xanî ye. Mixabin heta îro jî ew nehatiye wergerandin bo kirmanciyê.

Min guhortin di tekstên mîr Celadet Alî Bedir-Xanî de nekirine û xwestiye ev kitêb, wekî ko heye, bigihît destên xwendevanan.

Nêveroka ko di destpêka vê kitêbê de ye min lê zêde kiriye û herwiha min sernivîsên beş û nêvbeşan ji nû ve estetîze kirine. Min sernivîs ji rêzên tekstan derêxistine û danîne rêzeka xweser. Bi vî awayî xwendina tekstan hêsanîtir dibe.

Stockholm, 15-ê îlona 1998-ê

Arif Zêrevan

Elfabêya kurdî

Elfabêya kurdî ji sih û yek herfan hevedudanî ye:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Herf di dengdayiyê de du texlît in: dengdêr û dengdar.

Dengdêr ew herf e ko dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ko dixwedeng e, lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê kurdî de heşt dengdêr hene:

a, e, ê, i, î, o, u, û

Lewra ko di dengdaniya kurdî de dengdêrek geh kin û geh drêj nabe, dengdêrên kurdî di drêjahiya dengên xwe de sersekinî ne: kin û drêj in.

Dengdêrên kin: e, i, u

e	der	در	şer	شر	ser	سر
i	kin	كن	din	دن	bin	بن
u	kurd	كورد	kur	كر	kul	كل

Dengdêrên drêj:

a	av	آڤ	sar	سار	bar	بار
ê	dêr	دير	şêr	شير	mêr	مير
î	tîr	تير	zîv	زيڤ	şîv	شيڤ
o	dor	دور	sor	سور	kor	كور
û	kûr	كور	şûr	شور	dûr	دور

Di zimanê kurdî de bîst û sê dengdar hene:

b	bar	بار	bav	باڤ	ban	بان
c	car	جار	can	جان	cûn	جون
ç	çar	چار	çûn	چون	çem	چم
d	dar	دار	dan	دان	dîn	دین
f	fanos	فانوس	filan	فلان	find	فند
g	gav	گاڤ	giş	گش	garan	گاران
h	hîm	هیم	hêja	هیژا	halan	هالان
j	jin	ژن	jor	ژور	jajî	ژاژی
k	ka	کا	ker	کر	kom	کوم
l	lo	لو	law	لاو	lez	لز
m	mar	مار	mêj	میژ	mak	ماک
n	nan	نان	nerm	نرم	nas	ناس
p	par	پار	por	پور	pehn	پحن
q	qîr	قیر	qenc	قنج	qelî	قلی
r	rê	ري	rû	رو	reş	رش
s	sar	سار	sebat	ثبات	sofî	صوفي
ş	şor	شور	şev	شڤ	şa	شا
t	têr	تیر	taqet	طاقت	tûj	توژ
v	vajî	ڤاژی	vala	ڤالا	virnî	ڤرنی
w	war	وار	werîs	وریس	wek	وک
x	xanî	خانی	xwarin	خوارن	xar	خار
y	yar	یار	yek	یک	yarî	یاری
z	zor	زور	zabit	ضابط	nafiz	نافز-

Ji van pê ve du herfên biyanî hene ko birek ji kurdan wan dibêjin. Lewra ko ew herfên ha di eslê xwe de ne kurdî ne, me ew ne êxistine nav elfabêya xwe.

Ew jî »ح« û »غ« ne, me ew du herf bi danîna du deqean li ser »h« û »x« nîşan kirine.

ḧ ح ḧal حال ẍ غ ẍar غار

Ko ev du deq ketin ev herfên ha vedigerin ser herfên kurdî û dibin »h« û »x«.

Ji xwe piraniya kurdan şûna »غ« »خ« dibêjin:
xeyidîn خييدين , xeyidîn غييدين

»Hawar« dengê zanînê ye. Zanîn ji me
مه ژ زانين يه زانيني دنگي هاوار
re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê
كسى هر ڤدكه خوشيي و فلات ريا ره
ko xwe nas dike dikare xwe bide nas
ناس بده خوه دكاره دكه ناس خوه كو
kirin. »Hawara« me berî her tiştî heyîna
هيينا تشتي هر بري مه هاوارا كرن
zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko
كو لوما كرن ناس بده دى مه زمانى
ziman şerta heyînê a pêşîn e. »Hawar« jû
ژو هاوار ه پشين آ هيينى شرطا زمان
pê ve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîtî pê
پى كرديتي و كردانى كو تشتي هر ب پيڤه
bendewar e dê mijûl bibe.
ببه مژول دي بندواره

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzaniya elfabêya kurdî kuta kir. Ji niho pê de bi hûrhûnandina hevedudanîna wî dê mijûl bibin.

[Esas û bingehên elfabêyê]

Herwekî di gelek tiştan de têt dîtin dibe ko di cara pêşîn de di elfabêya me de jî kêm û zêde hin kêmanî dê bikevin ber çavan.

Ev kêmaniyên ha di eslê xwe de ji kêmaniyê bêtir paşiya hin kotekiyan in ko mirov ji wan nikare xwe bide alî.

Ji lewra piştî dan zanîna elfabê divêt awayê hevedudanîna wê û kitkitên bingehên wê bên rave kirin. Da ko xwendevanên me qenc têbigehin ko ew kêmaniyên ha herwekî me got ne kêmanî, lê di azîna elfabê de tiştinen adetî ne.

Ev benda ha ji bona berhevdana wê hatiye nivîsandin.

Lê berî destpêkirina berhevdanê divêt herçî esas û bingeh hene ko ji me re bûne hîm û elfabê li ser wan hatiye danîn bêne xuya kirin.

Me ev bingehên ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

1.
Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabêya tirkan nêzîk xistin û jê nedûrketin.

Armanca elfabê sekinandina dengan li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan tên nîşan kirin, û herf qebalewî û bihemd in. Ji lewra nîşankirina dengê »ج« bi »c« û yê »چ« bi »ç« û bihevguhartin û cihguhastina wan wekhev û bêferq e.

Lê bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabêya tirkî dinasin dê bikarin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bi hêsanîtî bixwînin.

2.
Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adetî ko di zimanên din de nas in, di elfabêya kurdî de hilanîn û neguhartin.

Bi vî awayî kurd dê bikarin elfabêya biyaniyan û biyanî ya me bi hêsanîtî fêr bibin.

3.
Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin.

Bêşik e ko hînbûn, xwendin, nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yên hevedudanî hêsanîtir e.

4.
Her dengî bi herfeke cida nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfekê an dengekî bi çend herfan, xwe dan alî.

Ev awa ji fikra çêkirina elfabêkê bi hindik herfan an ji qesda qenc lisersekinandina denganiyê dikare bizê.

Lê pê herdu jî nakevin dest û di zimanî de bila sebeb pirsinen di şiklî de cida peyda dibin û di nivîsandinê de tevlîhevîke mezin berpê dibe.

Ji xwe di ti zimanî de denganî û nivîsandin ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zimanî bê. Lewra ko kitkit û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê biwa diviya bû elfabêya her zimanî ji 50–60 herfan hevedudanî bibe.

5.
Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan ji hêlekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bênîşan û tevlî-hev dibin.

Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîke din e.

Ji lewra ji bona tevayiya herfên bênîşan me ev »^« pejirand, û bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguhêrîne hem bilind dike, û ji nîşanên wek (. - , – ') qenc têt veqetandin.

Ji xwe boşbûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

6.
Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bên û bikevin hev.

Ji lewra diviya bû ko em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabêyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin.

Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir.

Bi vî awayî û gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu daniye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn.

Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di

zimanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin.

Belê, herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tên xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guhêrîna cihderka dengan, lê belê ji guhêrîna rengên dengan têne pê, û ji lewra di elfabêyê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tinê dengan nîşan dike, ne rengê dengan.

[Dengdar]

Ezê bi dengdaran dest pê bikim. Ji sih û yek dengdarên kurdî, dengên hevdehên jêrîn, di elfabêya her zimanî de, bi ferqnên kiçik, yek in.

b, d, f, g, h, k, l, m, n, p, r, s, t, v, w, y, z

Tinê di elfabêya tirkî de »q« û »w« nînin. Ji ber ko di zimanê tirkî de denginen cida wek »v« û »w«; »q« û »k« nayin dîtin.

Dengê herfa »w« ji xwe di tirkiyê de peyda nabit.

Herçend di hin pirsên erebî de ko ketine nav zimanê tirkî ji »ک« pê ve »ق« hebe jî, tirk van du herfan cida cida bi lêv nakin. »ق« a erebî gora denganiya zimanê xwe wek »ک«-ke stûr dixwînin û dukan ji cihderkekê derdixînin. Ji ber vê yekê van her du dengan bi herfa »k« nîşan kirine û herfa »q« yekcar ne êxistin nav elfabêya xwe.

W

Herwekî me got di elfabêya tirkî de »w« jî nîne. Tirk dengên »w« û »v« wekhev bi lêv dikin û »و«-a erebî wek »v«-a kurdî û frensizî dixwînin. Lê di zimanê me de herfên »v« û »w«, herwekî di zimanê inglîzî de heye, cida têne dîtin û kurd dengên van herdu herfan ji cihderkên cida derdixînin.

Gelek pirsên kurdî hene ko bi guhêrîna van herfan û bi ketina wan li şûnên hev di mana wan pirsan de ferqinen mezin têne pê, wekî niho:

kevandin	kewandin
dev	dew
vir	wîr
ava	awa
evî	ewî

Herwekî têt dîtin me dengê »ڤ« bi »v« û yê »و« bi »w« nîşan kirin.

Niho divêt em texmîna wan tiştan bikin ko di heqê awayê nîşankirina wan de dikarin bên gotin.

Di paşiya vê bendê de sê cedwel hene. Cedwela pêşîn ji me re nisbeta herfên kurdî nîşan dide. [Li rûperê 33 û 34-ê fekire, Arif Zêrevan]

Gora wê cedwelê di zimanê me de nisbeta »v« 329:33793 û ya »w« 557:33798 herf hene »v« 329 û »w« 557 caran derbas dibe.

Jê dixuye ko di zimanê kurdî de »w« ji »v« bêtir e. Ji lewra, me dengê »ڤ« bi »w« û yê »و« bi »v« nîşan bikirna çêtir ne dibû? Bi vî awayî me dengê van du herfan ji dengên xwe ên navmiletî – ko îro wek dengên wan ên adetî têne hesêb – dûr bixistana.

Dûrxistina dengên herfan ji dengên xwe ên adetî, gora destûra me a diwim, tinê di kotekiyê de, an bi destxistina fêdeke mezin de, bihata çêkirin.

Kotekî yekcar nîne, fêde hebe jî gelek kiçik e, ne welê ye ko em ji bona wê destûreke xwe a bingehî feda bikin.

Belê »v« bi yek dran e, û »w« bi du dranan e. Lê herdu jî bi derbekê, bi liveke qelemê tên nivîsandin, ne ko »v« bi derbekê û »w« bi du derban.

Jû pê ve di denganiyê de »w« du »vv« tê hesêb, bi vî awayî deng û şiklên wan jî li hev tên. Ji xwe di zimanê frensizî û di hinên din de »w« re »double v« yanî »du car v« dibêjin.

Y

Ev herfa ha di hin zimanan de carinan dengdar û carinan dengdêr e. Herwekî berdêla wê a erebî »ي« jî carinan dengdêr û carinan dengdar e.

Me ew, tinê bi dengê xwe ê dengdarî êxist nav elfabêya xwe.

yar	يار
diyar	ديار
derya	دريا
beyar	بيار

Ev herfa ha di nav pirsên kurdî de gelek hindik têt dîtin. Perîcar dikeve navbera du dengdêran û wan digehîne hev.

derzî	derziya	Zînê
rê	rêya	welêt
ba	bayê	kur
tilî	tiliyên	wî

Ji hêla din ev herfa ha hîn bi hîn dikeve nav zmên û pê de meyildariya ketinê dike. Di zimanê kurdmancî de gava pirsekê ko paşiya wê bi »o« an »û« tê, dengdêreke biyanî dibit »w«-yek dikeve navbera wan û wan digehîne hev.

parsû	vê parsûwê	parsûwa stûr
çilo	vî çilowî	çilowê ter

Di hin deran de ev »w«-yên ha bi »y« re xwe diguhêrînin:

vê parsûyê	parsûya stûr
vî çiloyî	çiloyê ter

Gelo bi çi awayî ev du herfên ha pev diguhêrin?

Birekî kiçik ji kurdmancan – herwekî xelkê Botan – dengdêra »û« zirav dixwînin, yanî ne wek elmanan lê wek frensizan bi lêv dikin.

Ev kurdmancên ha dengdêra »o« jî wek »û«-wa adetî – ko di frensiziyê de bi »ou« têt nîşan kirin – dixwînin. Bi vê ferqa ko di bilêvkirina wan de hergav meyldariyek ber bi »o« ve heye.

Ev kurdên ha ko van du dengdêran nerm dixwînin ji bona hevgihandina van dengdêran bi dengdêrên din – herwekî bi »ê, î, a« têt çêkirin – li şûna »w« »y«-kê ditînin.

Ji ber ko bilêvkirina »y« ji ya »w« hêsanîtir û »y« dengdareke nerm e, hêdî hêdî dikeve zarên wan kurdan jî, ko dengdêra »û« stûr û »o« wek xwe dixwînin.

Carinan jî di nav pirsan de dikeve şûna »w«:

Suwar→siwar→siyar

Ji hêla din bi »h« re jî diguhêre:

gerîn	gerihan	geriyan
bezîn	bezihan	beziyan
	dihar	diyar
	mehîr	meyîr
	giha	giya

Ji aliyê din di pirsnen erebî de ko ketine nav zimanê me diguhêre û dibe »ê«:

زينب	Zeyneb	Zêneb
خير	xeyr	xêr
غيرت	Ẍeyret	Ẍêret
زينل	Zeynel	Zênel
فيضى	Feyzî	Fêzo

Divêt bête nîşan kirin ko di zimanê erebî ê axaftinê de jî ev »y«-yên ha carinan diguhêrin û dibin »ê«.

J, G

Ji van du dengdaran me »j« êxiste nav elfabêya xwe bi wî dengê ko frensiz wê bi lêv dikin û »g« herwekî elman wê dixwînin.

Berdêlên wan di elfabêya erebî de ev in:

j → ژ g → گ

Ş

Ev herf berdêla »ش«-a erebî ye. Dengê vê herfê di frensizî bi »ch«, di elmanî bi »sch« û di inglîziyê de bi »sh« têt nîşan kirin.

Ji herfên latînî ji bona nîşankirina vî dengî di destê me de ti herf ne ma bûn. Gora destûreke me diviya bû ko em bi herfên hevedudanî emel mekin. Destûra me a pêşîn em dixistin nîzîkî elfabêya tirkan.

Ji hêla din cihderka vî dengî gelek nîzîkî cihderka herfa »s« ye. Miletên ko di zimanê wan de ev deng nîne li şûna wî »s« dibêjin.

Di zimanê yûnanî de »ş« nîne. Ji lewra yûnaniyên ko nû dest bi frensiziyê dikin şûna »chambre–şambr« »sambr« dibêjin û pirsa »paşa« »pasa« dixwînin.

Di encamê de me ev deng wek tirkan, bi vê herfê nîşan kir.

Ji xwe ev şikl di elfabêya xelkê romanyayê de, ji mêj ve hebû.

X

Ev dengê ko di elfabêya erebî de bi herfa »خ« têt nîşan kirin di hin zimanên arî de jî heye, wekî niho elman vî dengî bi »ch« nîşan dikin. Lê miletên din, wek yûnan, bi »x« dinimînin.

Ev herfa ha di hin elfabêyan de, wek ya frensizan, du dengan bi hev re dinimîne û dide xwendin, yanî dengekî wê dutakî heye. Herwekî:

Alexandre	Aleksandre
Exemple	Egzemple

Ji ber ko dengê wê ê dutakî ji me re ne gerek bû, me ev herfa ha wek yûnanan û hin miletên din ji bona nîşankirina dengê »خ« êxiste nav elfabêya xwe.

K, Q

Dengên ko di erebiyê de bi »ق« û »ک« nîşan dikin û ji hev bi gelekî cida ne dizimanê me de jî cida cida peyda dibin.

Digel vê hindê »ق«-a kurdî ji ya erebî nermtir û siviktir e. Mirov dikare bibêje ko »ق«-a me nîzîk wê »k«-yê ye ko di pirsa »kristal« de têt dîtin û frensiz »cristal« dinivîsînin.

Ji bona nîşankirina van dengan di destê me de du herf hene: »k« û »q«.

Gelo bi kîjkê dengê pêşkî û bi kîjkê dengê paşkî divêt bête nîşan kirin.

Deng wekî ji pêşiya devê mirov derdikeve pêşkî û gava ji paşiyê derdikeve paşkî ye.

Herwekî »ق« paşkî û »ک« pêşkî ye.

Ji ber ko dengê »ق« ji qirikê û dengê »ک« ji pêşiya wî derdikeve.

Di zimanê frensizî, elmanî, û di hinên din de »qu« dengekî dide ko rast bi rast dengê wê »ک«-yê ye ko di pirsa »kar – کار« de têt bihîstin.

Xelkê eşîra Bêrtî ji çaryekê re carinan »kart« dibêjin. Di zimanê frensizî de jî »quart« heye û mana wê jî çaryek e.

Tinê frensiz »t«-ya paşîn naxwînin û wek »kar – کار«-a kurdmancî bê »t« dixwînin. Di van du pirsan de dengê »qu«-a frensiz û »k«-a kurdî wek hev in û di ti tiştî de ji yek hev ne cida ne, ne kêm, ne zêde ne.

Belê me goti bû ko »ق« dengekî paşkî ye. herçend ev deng, rast bi rast di zimanên arî de nîn be jî, di navbera »k« û »q« kêm û zêde ferqek heye, û di wan zimanan de jî herfa »q« di eslê xwe de, gora dengê herfa »k« dengekî paşkî nîşan dike.

Zimanên latînî ên îrû vî dengî perîcar bi herfa »c« nîşan dikin. Ji ber ko ev du herfên ha, di zimanên eslî de, berî hatina pê, zimaninen latînî ên îrû bi hev guherîne.

Di zimanê latînî ê kevn de »k« bi tinê di pirsên »kaeso« û »kalendae« karî bû xwe hilîne di ên mayîn de »c«-yek ketiye şûna wê ko xelkê Romayê ew mîna »k«-yek bi lêv dikirin û dixwendin. Herwekî di pirsên »cable, café, corbeille, corbe, cristal« de, ko bi »c«-kê têne nivîsandin, û ev »c« gora dengê »qu«-yê dengekî paşkî dide. Lê belê di zimanê elmanî de ko ev »k«-yên ha bi »c« ne guhêrîne ev pirsên ha bi »k« têne nivîsandin: »Kable, Korb, Kaffe, Koffer, Kristal«

Niho divêt em hinikî bi bihayê »k«-ya kurdî ê dengî mijûl bibin. Ji bona wê jî ezê »k«-ya kurdî deynim ber »c«-ya frensizî û », «a erebî.

Dê em pirseke frensizî bibin: »cri« dengê »c«-ya wê gelek nîzîkî »q«-ya me ye, û di navbera vê »c«-yê û »q«-ya pirsa »qîr« hema ti ferq nîne û mana wan jî yek e, »cri« di frensiziyê de »qîr« e.

Wekî niho, mirov dikare pirsa kurdmancî »qrên« bi elfabêya frensizî wek »crên« binivîsîne.

Li ser berhevdanîna dengê van herfan min çend tecribe çêkirine ko di zanîna wan de hin fêde hene. Herwekî:

1. Min ji hin xortên kurd re – ko ew hînî elfabêya kurdî kiri bûn – pirsa »cristal« da nivîsandin. Tevda li xwe geriyan û paşê bi hev re herwekî di elmaniyê de tête nivîsandin di şiklê »Kristal« de nivîsandin.

2. Min ev pirs ji hin xortên kurd re da nivîsandin ko herfên erebî nas dikirin lê li erebî nizanî bûn. Bi »ق«-kê ko di şiklê »قرستال« de nivîsandin.

3. Min ev pirs ji kurdekî re da nivîsandin ko bi erebî dizanî bû bi salan di medreseyan de xwendi bû, melayê min berî ko binivîsîne, hinikî sekinî, pirs çend caran bi lêv kir, di guhê xwe re kir û ji min re got:

4. Gora bilêvkirina kurdekî nezan ko bi erebî nizane divêt »قريستال« bête nivîsandin. Lê ko bi erebî hate xwendin dengekî paşkî dê bidit ko ji hundirê qirikê têt û kurmancekî nezan nikare derêxîne û weke xwe bi lêv bike. Ji lewra bi imlake erebî û fesîh divêt »كريستال« bête nivîsandin.

5. Min ev pirs ji erebekî re da nivîsandin. Qet li xwe negeriya û tavil di şiklê »كريستال« de nivîsand.

Nisbeta »q« di zimanê kurdî de 150:33798 û ya »k« 1056:33798 e. Yanî di zimanê me de »k« ji »q« bêtir e, û nivîsandina »k« ji ya »q«-yê hêsanîtir, siviktir e, û »k« ji »q« zûtir tête nivîsandin.

Ji sebebên bingehî pê ve ko yek bi yek hatine rave kirin, ber vê yekê jî me nîşankirina »ق«-ê bi »q« û ya »ک«-ê bi »k« çêtir û rastir dîtin.

C, Ç

Di destê me de »c« û »ç« mane. Me ev ji bona nîşankirina dengên »ج« û »چ« hilanî bûn.

Gora eslê van herfan dengê »چ« ji »ç« bêtir bi »c« dihat nîşan kirin. Herwekî di latîniya kevn, di babelîska şeşa de, ko diket pêşiya »e, i, y, æ, œ« dengê »چ« a me dida, mîna dengê »z« ya elmanî, wekî niho di pirsên jêrîn de: »Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, Cæsar, cœtes, caremonia«

Digel vê hindê me ev herf ji pêşiya xwe vekir, dengê wê ê kevn da alî û em di warê qebaleyê de man. Ji ber ko qebale li destûra me a pêşîn çêtir dihat û ji bona fedakirina wê destûrê çi fêde çi kotekî hebû.

Di zimanî de nisbeta van jî hema yek e: »c« 102:33789, »ç« 103:33789.

Di encamê de me dengê »ج« bi »c« û yê »چ« bi »ç« nîşan kirin.

Li hire dixwazim tiştekî di çavên xwendevanan re bikim.

Ew dengê ko di elfabêya erebî de bi »ج« têtе nîşan kirin di hin deverên Kurdistanê û di pirsinan de ne wek dengê xwe ê nas lê bi awakî din têt bi lêv kirin. Bi awakî welê ko ser dengê »z« ya elmanî diçe.

Dengdêr

Herwekî me berê jî goti bû dengdêrên kurdî di drêj- an kinbûna dengên xwe de sersekinî ne. Yanî dengdêreke drêj ticaran kin nabe û ya kin drêj [nabe].

Di yûnaniya kevn de dengdêr holê bûn, dengdêrek geh kin geh drêj ne dihat xwendin. Tinê di yûnaniya kevn de dengdêrinen navîn jî hebûn ko di zimanê me de nînin.

Dengdêrên kin ev in: e, i, u
Dengdêrên drêj ev in: a, ê, î, o, û

A, O

Ev du dengdêrên ha di zimanê me de jî wek yên zimanên din têne bi lêv kirin, lê hergav drêj in û ticar kin na bin.

Weko:

A	çak	dar	pak	bar
O	zor	gol	lor	

Tinê di zarê nîvro de carinan wek »eu«-ya frensizî û »o«-ya bi tirkî têtе xwendin. Hingê bi danîna du deqan li ser »o«-yê têtе nîşan kirin: köl, göl.

Ê

Gava me sehîtiya denganiya kurdî dikir em rastî dengekî hatin ko nîzîkî »فتحه، ثقيله«-yê erebî ye.

Ev dengê ha ko di cara pêşîn de li »a«-yeke kin dimîne di rastiyê de

ne »a«-yeke kin e, û nikare bibe jî. Ji ber ko di zimanî de »a«-ya drêj heye û kina wê nikare hebe.

Di encamê de xuya bû ko ev dengê ha ji »e«-ke stûr pê ve ne ti deng e. Belê ev dengê ha »e«-ke welê ye ko stûr têtе xwendin û herçî dengdarên ko didêre stûr dide xwendin.

Ev dengê dengdêrê tinê di hin deverên Kurdistanê de têtе bihîstin, ne di hemî deran de.

Hebû ko em vî dengî bi danîna du deqan li ser »e« nîşan bikin. Herwekî »e«-yên pirsên »pëz« û »sëd« ko bi herfên erebî bi »ظ« û »ص« wek »يظ« û »صد« dihatin nivîsandin û dengdarên wan stûr dihatin xwendin.

Ji hêla din ev ferqa bilêvkirinê di hin pirsên erebî de ko ketine hundirê zimanî têtе dîtin.

esker	ereb	elî
ësker	ëreb	ëlî

Bê şik e ko awayê bilêvkirinê bi »pez, sed, esker, ereb, elî« li dengayiya kurdî çêtir tê û diristir e.

Ez ko botî me van »ê«-yên ha ne wek piraniyê, lê wek hindikayiyê, yanî stûr »ë« bi lêv dikim. Digel vê hindê, madam em îrû elfabekê ji bona zimanekî – ne ji bona zar û zarawayan – çêdikin ev dengê ha nikari bû bête nîşan kirin. Herwekî me jî nîşan ne kir û ne xiste elfabêya xwe.

Min pirsên jorîn, ji hin xortên eşîra xwe û eşîrên dorê – ko hînî elfabêya kurdî kiri bûn – da nivîsandin. Qet li xwe ne geriyan û bi »e«-ke adetî nivîsandin. Hingî min ji wan re ji »ë«-ya stûr qal kir.

Bi awakî welê li min vegerandin ko pê mesele safî kirin. Ji min re gotin: »Di nav wan herfan de ko te nîşanî me kirin, me bêdişwarî ew herf peyda kir ko wî dengî bikare xuya bike. Jê diyar e ko ew deng

tinê bi wê herfê têtе nîşan kirin û ne bi herfeke din.«

e, i, u — ê, î, û

Niho, me ev şeş herf hene ko di pêşberê hev de du tovên di şiklî de nîzîkî hev ditînin pê.

Em van çarên jêrîn bibin destê xwe û bi van mijûl bibin:

e, i — ê, î

Lê herwekî me berê jî goti bû, di dengayiya kurdî de, dengdêrek carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in drêjên wan nîne û herçî drêj in kinên wan peyda nabin.

Ber vê yekê dengdêra »e« herçend bête drêj kirin ticar nabit »ê« ji ber ko cihderkên wan ji hev cida ne. Herwekî »i« jî bi drêjxwendinê nabit »î«.

Di destê me de ti herfên din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em bi herfên hevduanî emel mekin. Ji lewra ji bona nîşankirina tofa paşîn me ev »^« nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabêyên din de dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguhêrîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguhêrîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêj in û tucar kin nayên xwendin.

Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêk anî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkan dûr mekevin.

Li hire, di herfên »i« û »î« de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk »i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte nîşan kirin. Heke me welê bikira û

»i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte û ya drêj bi »i«-ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko »i« ke bê niqte di nav herfên »u, n, m« û di pêş- û paşê hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona veqetandina »i«-ke bê niqte ji herfên jorîn – ko ketiye rex an nava wan – ser herfa ko berî »i«-yê dihat işaretek berdidan.

Bêşik e ko me nikarî bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin.

Jê pê ve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zimanan cida ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketiye.

Tinê di heqê vê »i«-yê de tiştekî din heye. Dibêjin ko di zarê nîvro de ev »i«-ya ha carinan ziravtir tête xwendin. Nemaze di izafetan de. Ji ber ko di zarê nîvro de mê û nêr ne mane, jê ketine û izafeta erebî yekcar xwe xistiye nav wî zarî.

Wekî niho, di zarê bakurî de, gora mê- û nêrbûna pirs û navan du şikl hene:

kurê Remo	keça Remo
kurê di Remo	keça di Remo

Lê di zarê nîvro de, ji ber ko mê û nêr nînin, ev terkîbên ha wek izafetê têne gotin.

kuri Remo	keçi Remo

Ev izafetên henê di zarê bakurî de jî peyda dibin, lê ne di zimanê axaftin û nivîsandina adetî de, lê belê di zimanê dabê »edebiyat«-a kevn de, nemaze di şihran de ku bi wezna erûzê hatine nivîsandin.

Di zimanê bakurî de ev izafetên ha wek pirs û terkîbên biyanî ne, di

nav dîwanan de mane û ne ketine zimanê xelkî. Weko:

بگزاده یه یک ژ نسل میران

Bi elfabêya me û gora bilêvkirina kurdiya xwerû, herwekî xelk bi lêv dikin ev misra' divêt holê bête nivîsandin:

Begzade ye yek ji nesli-mîran

Navbera »nesli« û »mîran« me xêzkokek êxist, pê şiklê wî ê biyanî xuya dibe.

Digel vê hindê mirov nikare bibêje ko »i«-yên izafetên erebî hergav wek »i«-yên kurdî kin û stûr têne xwendin. Ji ber ko di wezna erûzê de ji bona destxistina ahengê ev »i«-yên ha ko »—«-a izafetê ne carinan drêj û drêjtir jî têne xwendin.

Lê heke di zarê nîvro de »i«-yin hene ko ji »i«-ya adetî ziravtir têne bi lêv kirin ev ziravî ne ji guhêrîna cihderka dengî, belko ji guhêrîna rengê dengî tête pê ko naye nîşan kirin.

Ji xwe di zimanê me û di her zimanî de dengdêr û tevayiya herfan gora zar, zarawan kêm û zêde, bi ferqinan têne bi lêv kirin, zirav û stûr dibin, hewrwekî di birê xwe de bête gotin.

Û

Ev dengdêra ha, dengdêreke bilind e, herwekî di pirsên »dûr, kûr, zû« de tête xwendin.

Piraniya kurdan vê dengdêrê wek elmanan yanî stûr û hindikayiyeke kiçik wek frensizan yanî zirav dixwînin.

U

Ev dengdêreke welê ye ko di zimanî de hevala wê nîne. Ev dengdêra ha ji du herfan, ji dengdarek û dengdêrekê hevedudanî ye.

Ji bona qenc xuyakirina dengê vê dengdêrê berî ewilî emê bi dengi-

nen din mijûl bibin. Ew bi xwe dengê vê dengdêrê dê xuya bikin.

Di her zimanê arî de pirs dikarin bi du dengdaran dest pê bikin, bi gotineke din herwekî dengdêrek di nava pirsê, di pêşiya pirsê de jî dikare du dengdaran bidêre.

Weko: *blûr, xwar, stûr, qrên, standin, braştin ...*

Di zimanê me de dengekî din jî heye ko li dengê vê dengdêrê dimîne. Ew deng jî dengê »xw« ye, wekî di pirsên jêrîn de:

xwe xwîn xwarin xweh

Ev dengê ha jî herwekî di pirsên »blûr, stûr, qrên, ...« de têtе dîtin ji du dengdaran hevedudanî ye û ketiye pêşiya dengdêrekê. Lê bi vê ferqa ko di dengdarên din de herdu dengdar cida cida têne bi lêv kirin. Lê wekê »x« û »w« dikevin tenişta hev, »x« li pêşiyê, »w« li paşiyê, ev herdu dengdar dikevin nav hev, li hev dikelin, û ji wan dengekî welê dertêt ko mirov dikare bibêje ko ew ne dengê du herfan e, lê belê dengê herfeke serxwe ye, ko di awayê bilêvkirina wê de ferqeke eşkere heye.

Belê ev herdu dengdêr dikevin nav hev û pêk ve têne bi lêv kirin. Herwekî di pirsa »xweş« da. Di vî dengê hevedudanî de dengê raser »x« ye û rind têtе bihîstin, û dengê din ko rengê wê diguhêrîne »w« ye. Di zarê dimilî de pirsa »xweş« bûye »weş«. Jê xuya ye ko herfa paşîn »w« ye û »x« ji pêşiyê ketiye.

Vêca, wekê ev du dengdarên ha »w« û »i« ne ewçend dikevin nav hev û li hev dikelin ko ji wan dengekî nû û dengdêrî derdikeve. Ev dengê ha diviya bû bi herfeke serxwe bihata nîşan kirin.

Me evê ha bi »u«-yeke bêbilindek nîşan kir û »u«-ya bibilindek ji bona »û«-ya drêj hilanî bû, herwekî jor ve hate dîtin.

Bi vî awayî ji bona dengdêrên kurdî qeydeyek hate danîn; dengdêrên bilind bibilindek in û ên kin bêbilindek in.

Ev dengdêra ha ko di xwe de dengdarekê vedişêre; herwekî pêşdetir bête rave kirin, dengdaran, nemaze çendekan, ji dengên xwe ên adetî stûrtir dide xwendin.

Me goti bû ko »u« ne kina »û« ye. Ji ber ko di denganiya kurdî de dengekî dengdêrî carinan kin û carinan drêj nabit. Herçend ji bona guhên nehînbûyî di cara pêşîn de wek nîzîkî hev xuya bibin jî di rastiyê de ji hev cida ne û cihderkên wan cida ne.

Guhekî ko qenc hînî denganiya kurdî bûye bê ti dişwariyê dikare vê ferqê rind bibihîse û tê derîne.

Digel vê hindê em dikarin birhaninen welê peyda bikin ko bê arîkariya guhan, rast bi rast bi çavan bêne dîtin û seh kirin.

Ji bona vê yekê jî emê bala xwe ji hin dengdêrên biyaniyan re bidin ko wekê dikevin zimanê me xwe diguhêrînin. Ziman wan napejirîne »qebûl nake« dengdêreke xwe dixe şûna wan.

[Ḍemmeya] »ـُ« erebî »û«-yeke kin e. Lewma ko di zimanê me de »û«-ya kin nîne di wan pirsên biyanî de ko »ـُ« hene ev »ـُ«-yên ha dikevin û li şûna wan »i«-yeke kurdmancî radibit.

Wekî niho di pirsên jêrîn de:

mirad	مراد
midîr	مدير
mihtac	محتاج
misilman	مسلمان
Silêman	سليمان

Ji lewra wekê zimanê me bi herfên erebî dihate nivîsandin di nîşankirina vî dengî de dişwariyeke mezin dihate pê. Ji xwe, ev deng di nivîsarên kevn de ticar qenc û rast ne hatiye nîşan kirin. Ji ber ko di nav herfên erebî de jê re berdêlkek ne dihate dîtin.

Ji bona rindxuyakirina doz û gotina xwe em bi pirsa »sund« xerîk »mijûl« bibin. Di pirsa »sund« de dengê »u«-yê bi »ـُ«-kê an bi »و«-kê

dihate nîşan kirin û pirsa *sundê* di şiklê »سوند« an »سند, صند« de dinivîsandin. Lê di herdu şiklan de jî dengê »u«-yê weke xwe xuya ne dibû. Ji ber ko bi »و«-ê dengê »û« dihate nîşan kirin û »و« dengekî welê nîşan dida ko di zimanê me de nîne. Lewma ko [ḍemmeya] »و« erebî ko »û«-yeke kin e di zimanê kurdî de nîne.

Lê bi her çî awayî jî hate nivîsandin ev dengdêra ha dengê xwe ê pêşîn winda ne kir, di devê xelkê de weke xwe ma û gehiştiye me.

Ji aliyê din ev dengdêra ha di nav zimanî de bi dengdêrinen din diguhêre û pê jî xuya dibe ko ev dengdêra ha ne »û«-yeke qin e.

Guhêrîna wê bi du awayan çêdibit: bi »i« û bi »o«

Di şiklê pêşîn de guhêrîn ne bi tevayî ye. Ji »u« ko ji »w« û »i« yê hevedudanî ye »w« dikeve û »i« bi tenê dimîne:

swiwar	suwar	siwar
şwiştin	şuştin	şiştin

Di şiklê diwim de »u« digel dengdêra ko di paş wê re têt winda dibit û li şûna wan dengdêreke bilind, »o«-yek radibit:

cuht	cot
suhtin	sotin

Ev »u« carinan, dengdêran jî bi xwe re dibit:

bihurîn	borîn

Ev dengên ha, berê di zimanê farisî de jî hebûn. Lê pêşdetir jê ketine. Digel vê hindê di nivîsandinê de şiklên xwe weke xwe hilanîne:

xwaher	xaher	خواهر
xweş	xoş	خوەش
xwasten	xasten	خواستن
xwace	xace	خواجه

Herwekî nivîsevanê zimananazîveke farisî »فارسی رهنمای« qala wan kiriye, lê bi awakî natevav.

»Di zimanê farisî de ji van pê ve du herfên din jî hene ko mirov wan dikare bi »خو«-yeke bi sê niqtan û bi »قو«-yeke bi sê niqtan nîşan bike. Ev dengên ha hetanî îrû di zimanê farisî de dijîn û di dora Kurdistan, Xozistan û di Şîrazê de têne bi lêv kirin.«

Mayîna van dengan di wan doran de ji hikmê denganiya kurdî ye. Ji ber ko çiyayên Kurdistana Ecemistanî heta Xozistanê drêj dibin û li Şîrazê gelek kurdên bextiyarî hene.

Ev »خو«-a ko bi sê niqtan tête nîşan kirin ji »xwe«-ya me pê ve ne ti tişt e. »قو«-a bi sê niqtan jî »q«-yeke kurdî ye ko »u«-yeke me ketiye pêşiya wê. Ji xwe me berê jî goti bû ko »u«, nemaze hin dengdaran, ji ber ko di wê de dengdareke veşartî heye, stûr dide xwendin.

Nivîsevanê rehnimayê rind bala xwe da bû ko ev »ک«-yên ha ji ên adetî stûrtir, lê ji »ق«-ê siviktir têne xwendin. Ji lewra bi zêdekirina niqtekê ser »ق«-ê dil kiriye dengê wê binermine û dengekî navbera »ک« û »ق«-ê bisekinîne. Ev deng jî ji dengê »k«-yên pirsên jêrîn pêve ne tu deng e: *kul, kur, kun, kuç.*

Lê, ji ber ko zimanê farisî zemanekî drêj bi herfên erebî hatiye nivîsandin û pê dabeke wî mezin heye û gelek pirsên erebî têketine û denganiya erebî bi gelekî lê hikm kiriye, ew dengê ko me bi »u« nîşan kir di zimanê eceman de yekcar winda bûye û bûye »و«-ke erebî.

Nivîsevanê rehnimayê ji ber ko nikari bû dengdêrê bibîne, bawer kir ko ev dengê dengdareke serxwe ye, ji »ک«-ê cida ye. Ji lewra ew bi »ق« ke sê niqtan nîşan kir.

Herwekî xwendayinen me ko di medresan de xwendine û di bin hikmê isûlê elfabêya erebî de mane dibêjin ko di zimanê kurdî de jî, ji »ق«-ê pê ve du »ک«-ên din hene. Mîna dengdarên ereban: »س« û »ص«, »ت« û »ط«.

Nisbeta herfên kurdî

1. Nisbeta giştî

a	1 500	î	700	ş	160
b	650	j	300	t	400
c	120	k	650	u	120
ç	150	l	450	û	450
d	840	m	550	v	500
e	2 200	n	1 300	w	350
ê	1 000	o	400	x	340
f	150	p	120	y	200
g	200	q	140	z	150
h	350	r	1 100		
i	1 800	s	340		

2. Di destpêka bêjeyan de

a	97	î	12	ş	188
b	238	j	22	t	275
c	135	k	417	u	0
ç	179	l	96	û	4
d	282	m	259	v	44
e	120	n	126	w	28
ê	11	o	5	x	227
f	111	p	195	y	4
g	184	q	215	z	148
h	258	r	170		
i	16	s	292		

Ev herdu cedwel û ya li rûperê 34-ê ji pirtûka Celadet Alî Bedir-Xanî û Roger Lescotî »Grammaire kurde – dialecte kurmandji« hatine girtin.

3. Nisbeta herfan di zaravayên cida de

	Bakur	Başûr	Rojavayê bakurê (Palo)	Rojavayê bakurê (Siwêrek)
a	239	232	292	292
b	73	90	67	68
c	10	20	27	28
ç	29	24	27	26
d	101	109	95	94
e	378	564	386	389
ê	170	85	151	167
f	12	6	13	12
g	44	51	40	38
h	56	47	53	53
i	337	291	308	296
î	139	160	142	145
j	62	10	0	5
k	116	137	88	89
l	64	130	66	63
m	112	140	114	114
n	260	231	238	253
o	60	44	115	121
p	27	28	30	29
q	11	14	14	13
r	191	209	212	222
s	41	45	39	41
ş	57	69	57	55
t	133	131	86	90
u	29	37	38	38
û	62	54	40	44
v	65	0	69	71
w	83	161	95	98
x	50	33	39	41
y	51	68	45	44
z	38	36	77	76

Rêmanên berpêşkî

Gramêr

1 Gramêr tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zmên e.

Zmanê kurdmancî

2 Zmanê kurdmancî zmanê miletê kurdmanc e. Kurdmanc pê daxêvin, dinvîsînin û bi gotinên din his û fikrên xwe pê eşkere dikin.

Hêmanên zmên

3 Di zmanê devkî de hêmanê bingehîn deng e. Deng bi tîpan têne sekinandin û bi wan zmanê nivîskî dest pê dike. Bi tîpan kît û bi kîtan bêje bi hev dikevin. Pirîcar bêje an kesekî an tiştekî dinimîne. Û gava çend bêje bi awakî manadar digehin hev ji wan komek çêdibe. Komek fikreke tam dide zanîn.

Bi peyhevketina komekan qiset tête pê. Qiset bi mijarekê mijûl dibe û ew zman bi xwe ye. Ji gotinên jorîn dixuye ko hêmanên zimên çar in:

Tîp: a g ê y h o p m j
Kît: ta, den, ser, co, rût, a, poz, ê
Bêje: hesp, peyar, xanî, spehî, gotin, were
Komek: Par ez çû bûm Rewanê. Îro dinya sar e. Gundê me di navbera du avan de ye.

Tîp

4 Her dengê ko di dev û qirika me de peyda dibe, li ser kaxezê bi işaretekê tête sekinandin. Ji wan işaretan re tîp dibêjin.

Tîpên zmanê kurdmancî

5 Di her zmanekî de herçend deng hene ewçend jî tîp peyda dibin. Ji ber ko di zmanê kurdmancî de sih û yek dengên bingehîn hene ji lewre tîpên zmanê kurdmancî sih û yek in.

Hûrek: a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z
Girdek: A B C Ç D E Ê I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

5 Bi adetî û gelemperî em bi hûrekan dinivîsînin. Girdek kêm caran tên istîmal kirin. Komek bi girdekekê dest pê dike. Tîpa serenavekî a pêşîn hergav girdekek e.

Dengdayiya tîpan

6 Tîp ji awirê dengdayiyê ve bi du biran leva dibin: dengdêr û dengdar.

Dengdêr

7 Dengdêr ew tîp in ko bi serê xwe ji devê me dertên û dengekî mûsîqayî tînin pê. Dengdêrên zmanê kurdmancî heşt in: a e ê i î o u û

Dengdar

8 Dengdar ew tîp in ko bêî arîkariya dengdêrekê nikarin ji devê me derkevin û dengekî musîqayî bînin pê. Ew di devê me de dikevin hin cihan, wek lêv, dran û ezmandev û ji wan pêjneke ker peyda dibe. Dengdarên zmanê kurdmancî bîst û sisê ne: b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

ŞANEK

Di pratîkê de dengdêr ji dengdaran bi awayê jêrîn têne derêxistin. Dengdêr bi serê xwe jî dikarin kîtekê bînin pê. Lê dengdar bêî dengdêrekê tu kîtê nayînin pê. Herwekî di kîta »par« de heke me dengdarên (p) û (r) xistin û (a) bi tenê hişt ew (a) bi serê xwe jî kîtek e. Lê (p) û (r) bêî (a) yê, an dengdêreke din, nikarin kîtekê bînin pê.

Doma dengdêran

9 Dengdêr ji awirê domê ve bi du biran par dibin, kurt û dirêj:

Dengdêrên kurt: e i u
Dengdêrên dirêj: a ê î o û

Dengdêrên kurt bi derbekê ji devê me dertên, devê me bi nîvî vedibe, doma wan hindik e û ew tu caran dirêj nabin.

Dengdêrên dirêj gava ji devê me dertên dom dikin, devê me bi temamî vedibe û ew tucaran kurt nabin.

Herçend dengdêrên kurt (e i u) û dengdêrên dirêj (ê î û) ji aliyê şikilî ve nîzingî hev bibin jî, ji aliyê dengî ve ji hev dûr û gelekî biferq in. Ji ber ko cihderka heryekê cida ye.

Xweseriya hin dengdêran

10 Dengdêrin hene ko nikarin bikevin pêşî an paşiya hin dengdaran. Hinên din jî di pêşî an di paşiya bêjeyan de peyda nabin:

I

Ev dengdêra ha bi gelemperî nakeve pêşî an paşiya bêjeyan. Yanî bêjeyên kurdmancî ne bi (i) yê dest pê dikin ne jî pê temam dibin; ji hin daçek û pronavan pê ve; mîna: li, di, ji, bi, çi

Ji milê din bêjeyên ko di eslê xwe de ne kurdmancî ne, û ji zmanê biyaniyan ketine zmanê me bi »i«-yê dest pê dikin.

Wek: »Ibret, icra, iflas, imza, inkar, insaf, işaret«. Ji xwe kurdmancên kevin gava ev bêjeya ha bi lêv dikirin »h«-yek didan pêşiya wan û digotin: (hibret, hicra, hiflas, himza, hinkar, hinsaf, hişaret). Ev bilêvkirina ha hetanî îro jî di hin cihên Kurdistanê de peyda dibe.

ŞANEK

Dengdêra »i« di hin bêjeyan de û gava kîtek bi wan bêjeyan ve dibe, naye xwendin, lê tête nivîsandin; ji ber ko di esilê bêjeyê de »i« heye û gava kîta ko wê nade xwendin jê dibe »i« tête bi lêv kirin. Wekî niho, »i«-yên bêjeyên »qetil, bihin, remil, qifil, resim, eqil, qedir, qehir, rikin, kevin, şikil, qesir, fikir, şikir, sihir, tevin, tihin« gava bêje bi serê xwe ne têne xwendin. Lê heke kîtek bi paşiya wan ve bû ew »i« nayine bi lêv kirin. Herwekî: »qet'la wî, ev çi bih'n? bi rem'lê dizane, bi qif'lê, van res'man, eq'lê te, qed'rê wî, ji qeh'ran, rik'nên Birca-Belek, ev kev'n e, di vî şik'lî de, qes'ra jorîn, bi vê fik'rê, şik'ra xwe, bi sih'rê, li ser tev'nê, ez tih'n im«. Lê ew di vê bilêvkirinê de jî vekîta xwe a bingehîn hiltînin û di şiklên jêrîn de têne nivîsandin.

qetila wî, ev çi bihin e? bi remilê dizane, bi qifilê, van resiman, eqilê te, qedirê wî, ji qehiran, rikinên Birca Belek, ev kevin e, di vî şikilî de, qesira jorîn, bi vê fikirê, şikira xwe, bi sihir e, li ser tevinê, ez tihin im.

Lê heke pêr an parkîtek bi wan ve bû û pê bêjeyeke nû û hevedidanî hate pê, heke (i) ne ketiya bêjeya nû naye nivîsandin. Ji ber ko ev pêr an parkît nema ji wê bêjeyê dibin û ev bêjeya hevedidanî bêjeke biserxwe ye û wê vekîta xwe a xweser heye. (Kevin, kevnar. Bihin, bihnok. Tevin, tevnepîrk)

Lêbelê, heke ji bervajî ve di bêjeya nû û hevedidanî de (i) hate bi lêv kirin tête nivîsandin jî. (şikir, şikirdar; sihir, sihirbaz; qedir, qedirgiran)

U

Ev dengdêra ha bi gelemperî dikeve paşiya dengdarên »g, h, k, q, x« û di paşiya dengdarine din de kêm caran peyda dibe. »Hunda, hundir, guh, guher, gul, gulat, gulok, guman, guzvan, kuç, kul, kulî, kum, kurt, kurm, qub, qul, qurç, qunders, qure, qurm, qurtik, xubar, xumre, xur, xurdek, xurîn, xurt«. Bêjeyên wek »du« û »tu« awarteyên vê qeydê ne.

Ji milê din tu bêjeya kurdmancî bi »u«-yê naqede, ji hin awartan pêve; herwekî pê dest pê nake jî.

Ji xwe ev dengdêra ha hêj di zimên de biserketina xwe ne qedandiye. Ji lewra û li gora bilêvkirina kurdmancên ko »w« û »i«-yê bi temamî li hev naxin bêjeyên wek »xurdek« bi awayê »xwirdek« jî dikarin bêne nivîsandin.

Ê, Î

Ev dengdêrên ha tucaran nakevin ber dengdara »y«-ê. Lê heke ev dengdêr bi awakî bi »y«-yê ve bûne hingê ev yanî »ê« û »î« bi dengdêra »i«-yê diguhêrin û ev »i« dikeve şûna wan. Wekî niho:

Ê

pê	piyên min	vî piyî

dê	diya te	vê diyê
rê	riya wan	van riyan (1)
Î		
derî	deriyê me	vî deriyî
tilî	tiliyên min	vê tiliyê
xanî	xaniyê te	van xaniyan
kursî	kursiyên wî	van kursiyan

Lê heke »y« bêî ko bi wan ve bizeliqe kete pêşiya van dengdêran, hingê (ê) û (î) herçend (i) bêne xwendin jî di nivîsandinê de bi (i) yê nayine guhartin û weke xwe dimînin. Herwekî di komekên jêrîn de (ê) û (i) ya bêjeyên (kî, kê, derê) »i« têne xwendin, yanî (ki, ki, deri) lê di nivîsandinê de di şikilên xwe ên eslî de têne şanî kirin: *Ev kî ye? Tu kurê kê yî? Ew xelkê kûderê ye?*

Û

Dengdêra (û) tu caran nakeve pêşiya dengdara (w). Lê heke ev her du tîp bi awakî bi hev ve bûne hingê (û) jî bi (i) diguhêre. Herwekî di bêjeyênjêrîn de:

rû	riwê min	vî riwî
xwesû	xwesiwa te	vê xwesiwê
ez bûm	ez biwam	tu biwayî
ez çûm	ez biçiwam	tu biçiwayî

ŞANEK

Nemaze kurdmancên ko (û) yê zirav bi lêv dikin, li şûna (w) yê li ber (u) yê (y) ekê dixin. Hingê (û) ji ber ko (û) û (y) dikarin bigehin hev, weke xwe dimîne û naguhêre.

rû	rûyê min	vî rûyî
xwesû	xwesûya te	vê xwesûyê

---

(1) Ji kurdmancan birekî piçûk »ê«-yê bi »e«-yê diguhêrînin û dibêjin:

pê	peyê min	vî peyî
dê	deya min	vê deyê

Ji xwe di zmanê kurdmancî de bêjeyên ko bi dengdêrekê temam dibin kêm in. Herwekî yên ko bi dengdêran dest pê dikin ne gelek in.

11 Hersê dengdêrên mayîn, yanî (a, e, o) bi her dengdarê ve dibin û bi tu awayî bi dengdêreke din naguhêrin. Bi tenê dengdêra (e) gava digihe (e) yeke din û (y) yek dikeve navbera wan, ji bo kurtiyê mirov dikare van her du (e) yan bi (ê) an bi (a) kê bide û (y) yê yekcar ji navê bêxe. Wekî niho:

Maseyek	masêk	masak
Perçeyek	perçêk	perçak
Perdeyek	perdêk	perdak
Beyanameyek	beyanamêk	beyanamak

Tîpa dubare

12 Di zmanê kurdmancî de tîpa dubare nîne. Ji lewre, heke di bêjeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan ji ber xwe de dikeve û tîpek bi tenê dimîne. Wekî niho, parkîta (tir) gava dikeve paşiya bêjeyên ko bi (t) yê temam dibin yek ji wan her du »t«-yan dikeve. Ji lewre di nivîsandinê de jî (t)-yek bi tenê tête nivîsandin Ji ber ko di vekîta kurdmancî de tîpa ko naye xwendin, naye nivîsandin.

Ev in çend misal:

xurt	xurt - tir	xurtir
rast	rast - tir	rastir
kurt	kurt - tir	kurtir

Çend misalên din:

paş - şîv	paşîv
baş - şev	başev
yek - kîte	yekîte

Tîpên têvel, lê ji yek cihderkê, an ji cihderkên nîzingî hev jî nadin pey hev:

rind - tir	rintir
pişt - dawî	pişdawî

bilind - tir	bilintir
dewlemend - tir	dewlementir

ŞANEK

Digel vê hindê û ji ber hin bêgaviyên vekîtê, hin tîp – nemaze di daçekan de – herçend neyin jî bi lêv kirin, têne nivîsandin. Ew nayine bi lêv kirin, ji ber ko bi awakî tîpeke dubare ditînin pê. Lê ew ne bi hev ve ne, ji hev cida, û yeke wê di dawiya bêjekê de û a din di destpêka bêjeke din de ye.

Ez di gund de bûm.	(gun'de)
Dengbêj jî hene.	(dengbê' jî)
Serheng gî hotin.	(serhen' gî)
Ji gayê gewir re.	(gew' re)
Ez ji kû zanim.	(e' ji)

S

Di hin cihên Kurdistanê de gava ev dengdar »s« dide pey dengdêrekê wê hinek tîj weke »z«-kê dixwînin. Ev awayê bilêvkirinê nakeve nivîsandinê û »s« hergav weke xwe yanî »s« tête nivîsandin û bi »z«-yê nayeta guhartin.

Awayê nivîsandinê	**Awayê bilêvkirinê**
Biguhêsîne	Biguhêzîne
Selete	Zelete
Ez çûm Parîsê.	Ez çûm Parîzê.
Ez derbas bûm.	Ez derbaz bûm.
Ji pesnan dîştexile.	Ji peznan dîştexile.

Kît

13 Bi vebûn û hatingirtina devê me dengek tête pê. Ji tevayiya wî dengî re kît dibêjin. Kît ji yek an ji yekê bêtir tîpan hevedidanî ne. Di kîtên zmanê kurmancî de bi gelemperî ji yekê heta pêncan tîp peyda dibin.

1. a ê û
2. no an ez ma pê

3. dev erd pêr sto kar
4. qenc dran deng pişt
5. stran stand

14 *Kîtên bêjeyê:* Herwekî di kîtan de, ji yekê heta pênca tîp peyda dibin, bêje jî an ji kîtekê an ji çend kîtan bihevketî ne. Bêjeya ko ji kîtekê hatiye pê jê re yekîte, û bêjeya ko ji çend kîtan hevedidanî ye jê re pirkîte dibêjin.

Bêjeyên yekîte: dar, dran, got, strand, xwar, deng, têr, no

Bêjeyên pirkîte: serşok, dengbêj, mêvandar, hilfirandin, dixwîne, qermiçandin, balafirgeh, rojnamevan.

Not: Bêjeyên pirkîte li gora hejmara kîtên xwe binav dibin: Yekîte, dukîte, sêkîte, çarkîte, pênckîte ...

Bêje

15 Tiştê ko têtе bîrê û di dil de radibe fikirek e. Ev fikir carina şikilekî û carina manakê dîtine pê. Ev her du awayên fikirê bi bêjeyan têne eşkere kirin. Bi gotinên din her bêje nimînendeyê fikirekê ye. Wek:

dereng, hesp, reş, wan, hatin, jê ... re, digel, ez, hevraz, berwar, mehder, lo, zû, dixwar, nêr, belek, çavreş, tîj, dilovan.

Birên qisetê

16 Bêje li gora mana û dehkerên xwe ji hev biferq in. Birekî wan mirov, heywan û tebayine nerihber yên ko bi dest têne girtin an dikevin ber bînahiya me şanî me didin. Birekî din tiştine welê pêş me dikin ko ew bi dest nayine girtin lê di bîr û di ber çavên me de radibin. Ji aliyê din bêjeyine welê hene ko bi serê xwe nikarin tu tiştî raver bikin, lê gava bi bêjeyên din ve dibin û dikevin navbera wan mana wan diedilînin, dibin serî û wan bi hev re girêdidin. Ji lewra di her zmanî de bêje li gora manayên xwe û cihê ko di qisetê de dibin û wezîfa ko li ser xwe digirin bi çend biran leva dibin. Ji wan re birên qisetê an texlîtên bêjeyan têtе gotin.

Di zmanê kurdmancî de birên qisetê deh in: *navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav, lêker, jmarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan*

Guhêrbarî

17 Birên qisetê ji awirê guhêrbariyê ve bi du biran leva dibin: *guhêrbar* û *neguhêrbar.* Ji birên qisetê pênc guhêrbar û pêncên din neguhêrbar in.

18 *Bêjeyên guhêrbar:* Bêjeyên guhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî diguhêrînin, têne tewandin û dikevin şikiline din.

Navdêr
Cemşîd, Sînemxan, kaxez, kerî, şîpane, piling, Herekol, can, qencî, spîtahî, selef, mehder, xurdebîn.

Veqetandek
ê, a, ên, ek, in.

Pronav
ez, we, ew, yên min, evê ha, çi, kî, kê, ko, kîjan.

Jmarnav
yek, du sed, heştek, nîvyek, çare çar, yeko yeko, pênc bi pênc.

Lêker
were, dixwar, dê bihata, keti bû, divêt, nivîsandin, xwendi bûn, daket, çikandin.

19 *Bêjeyên neguhêrbar:* Bêjeyên neguhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî tucaran naguhêrînin û hergav weke xwe dimînin.

Rengdêr
gewr, nû, qenc, bilintir, helesor, mezin, spehî, nizim.

Hoker
holê, îro, hingê, nik, bes, kêm, kû, kengê, niho, no, belê.

Daçek
di, li, ji, di ... de, ji ... re, der, digel, berî, paşî, piştî.

Gihanek
wek, û, an, lê, ko.

Baneşan
lê, lo, ax, hey, way, ho, ox.

Vekît

29 Vekît tevayiya isûl û qeydeyên nivîsandin û bihevebûna bêjeyan e. Bi gotinên din her bêje vekîta wê, yanî şikilekî nivîsandina wê î xweser heye. Bi tenê bêjeyên ko bi çend awan têne bilêvkirin bi çend awan jî têne nivîsandin. Herwekî: »bihurin/borîn, rih/rî, reh/ra, nêzing/nîzik, şehristan/şaristan, teva/teba, bihin/bîn, birçî/birsî, nimêj/nivêj«.

Ji milê din vekît ji me re bêjeyên ko biheve dibin û yên ko biheve nabin ji hev vedigerîne û awayê bihevebûna wan şanî me dide.

Qeydeyên vekîtê ji tevayiya gramêrê dertên. Di bihevebûna bêjeyan de qeyda gelemper ew e ko her bêje bi serê xwe tête nivîsandin û bi bêjeyine din ve nabin; ji hin awartan pê ve. Wekî niho, di komeka »Ez dihî li nêçîrê bûm« de tu bêje bi yeke dî ve ne bûye, ji ber ko her yeke wan ji birên qisetê texlîtekî din e. »Ez = pronav, dihî = hoker, li = daçek, nêçîr = navdêr, bûm = lêker.« (ê) ya ko bi »nêçîrê« ve bûye tewang e; û tewang hergav bi navdêr û pronavî ve dibin.

Niqteşanî

30 Qiset bi hin nîşandekan ji hev dibe. Ev nîşandek dawî û birên komekê pêş me dikin. Bi danîna van nîşandekan mana qisetê çêtir li hev bi der têt. Ji isûlê danîna nîşandekan re niqteşanî dibêjin. Ji milê din em bi niqteşaniyê, di dema xwendinê de cihên rawes û wêsihê jî dizanîn û li gora nîşandekan, cih cih û kêm û zêde disekinin û bihna xwe didin.

31 Nîşandekên niqteşaniyê ên bingehîn ev in:

(.) Niqte
(?) Niqtepirs
(!) Niqtebang
(:) Niqtecot
(;) Niqtebihnok
(,) Bihnok

Ji van pê ve çend nîşandekên din hene ko em wan kêm caran dixebitînin; û wezîfa wan ji ên jorîn cida û bi awakî din in.

( ) Kevanek
« » Dunik
— Xêzek
- Bendik

Niqte

Niqte paşiya komekê şanî dide. Ji lewre gava komek temam dibe li dawiya wê niqteyek tête danîn: *Hêv tariya şevê diedilîne. Bi reşandina avê şewat tête vekuştin. Bedena Diyarbekrê bedeneke kevnare ye. Xwîn bi xwînê nayê şiştin.*

Niqtepirs

Niqtepirs dikeve paşiya komekên pirsiyariyê. Ji manê pê ve ew jî reng û dengê pirsiyariyê dide qisetê: *Genco kengê ji welêt hatiye? Hevind çi dinivîsîne? Te çend kew kuştine? Kî ji derincê de ket?*

Niqtebang

Niqtebang dikeve ber baneşanan û li paşiya komekên baneşaniyê. *Ax! ez çiqas têşim! Binve kezeba min; binve lo lo! Way li min ax ezo! Xwedêo! tu bi rehma xwe kî.*

Niqtecot

Gava li ber komekê tiştek têtе gotin an hejmartin; niqtecotek dikeve paşiya komekê. *Bavekî di dema mirina xwe de ji zariwên xwe re got: Zarono! ez ji we re navekî pak dihêlim; qedirê wî bizanin û wî weke xwe hilînin. Mirovê hêja bi sê tiştan hêja ye: mêranî, xebat û comerdî.*

Niqtebihnok

Niqtebihnok dikeve navbera wan hevokên ko bi hev re girêdayî ne û mana hev diedilînin û wê dibin serî. *Dewlemendî bi hinarê ye; ne bi mal û pereyî ye.*

Bihnok

Bihnok dikeve navbera wan bêjeyên ko di komekê de dane pey hev û bi gihanekekê ne hatine girêdan. Di vî halî de bihnok, bi awakî cihgirtiyê gihanekê ye. Ji milê din ev nîşandek dikare bikeve navbera birên komekê ên kiçik jî. Bi şertê ko bi danîna wê mana komekê neyit guhartin. *Temo, Cangîr, Hevind û Ferzende brayên hev in. Sor, spî, kesk û zer rengên ala me ne. Mirov bi axaftin, nivîsandin û xwendinê ji heywanan têtе ferq kirin. Kurên min, hon çire bi ya min nakin û bi ya xelkê dikin. Em hemî, emê herin şerê welêt. Belê, ez jî, ezê bi we re bêm.*

Rewes û vêsih

32 Me goti bû ko nîşandekên niqteşaniyê, di qisetê de cihên rawes û vêsihê jî şanî me didin. Herçî niqte ne cihê rawesê ne; yanî di wan de mirov qederekî disekine. Herçî bihnok û niqtebihnok in cihê vêsihê ne; û di wan de em hindik disekinin. Vêsiha bihnokê ji hemiyan kurtir e.

33 Nîşandekên mayîn.

Kevanek

Kevanek li pêşî û li paşiya wan pirsan têtе danîn ko bi sebebekê keti-

ne komekê û heke jê hatine hilanîn mana komekê ne kêm dibe, û ne jî diguhêre. *Belayê (wê nexweşiya xedar) ez gelekî êşandim. Segmanên me hemiyan (qederê bîst û pênc mêr) li rêlê wer hatine û şergeh girtin.*

ŞANEK

Li şûna kevanekan mirov dikare xêzikan jî bêxe. *Belayê – wê nexweşiya xedar – ez gelekî êşandim. Segmanên me hemiyan – qederê bîst û pênc mêr – li rêlê wer hatin û şergeh girtin.*

Dunik

Dunik dikevin pêşî û paşiya wan pirs û komekên ko mirov wan ji derve ditîne û têxe qisetê. Te ne bihîstiye ko dibêjin: »Her tişt bi zravî dişkê; mirov bi stûrî«. Ehmedê Xanî ji bo kitêba xwe gotiye:

»Ev meywe eger ne avdar e«
«Kurdmancî ye ev qeder li kar e«

Xêzek

Dema ko qiset dikeve şiklê axaftinê û carê ko xeberbêj diguhêre; li pêşiya gotinê xêzekek tête danîn;

Mizgînî dan kerê û gotin ê:
— Dehşik ji te re bû.
Kerê li wan vegerand û got:
— Êmê min kêm, barê min zêde bû.

Bendek

Bendekê datînin navbera du bêjeyên ko di navbeyna wan de hogiriyek heye. *Kariyê-belek, Kariyê-kelehê, Birca-Belek, Bedir-Xan.*

Ji milê din gava ji kêmbûna cih kîtên bêjeyê ji hev de dikevin ev nîşandek wan kîtan bi hev re girêdide. Hingê bêje dibe du perçe; perçekî wê di dawiya xêzekê de dimîne û perçê din dikeve peşiya xêzeke nû.

Gava ev bêgavî tête pêş, divêt bêje kît bi kît ji hev bêne xistin; bêî ko

tîpeke kîtê jê bibe û bikeve xêzeke din. Mesela heke (nermijandin) kete paşiya xêzekê û tê de cih ne bû; ev bêje bi vî awayî tête birîn: (ner mi jan din) û ji van çar kîtan hin divêt bikevin paşiya xêzê û ên an a mayîn pêşiya xêza nû, bêî ko ji tîpên her çar kîtan ne tu jî ji hev bibin.

Navdêr

34 Navdêr ew bêje ye ko kesekî heywanekî an tiştekî şanî me dide. Ji lewre bêjeyên *Zîn, pismam, şêr, hesp, post* û *kursî* navdêr in. Ji ber ko ji van her şeş bêjeyan dido hin kesan, didowên din hin heywanan û didowên mayîn jî hin tiştan pêş me dikin.

Hevenav û serenav

35 Navdêr di nav xwe de û di bingehî de bi du biran leva dibin: hevenav û serenav.

Hevenav

36 Hevenav ji wê navdêrê re dibêjin ko ji yekî bêtir kes, heywan an tiştan dinimîne û wan bi hev re bi nav dike. Herwekî *rêwî, hesp, çiya.* Bêdiro, gava em *rêwî* dibêjin; ev bêje navê her mirovî ye ko bi rê ve diçe. Bêjeya *hesp* jî welê ye; pê herçî heywanên wî cisnî hene têne seh kirin. Bi bêjeya *çiya* herçî bilindcihên dinyayê hene ko ne gor, ne mitik in û ji wan bilintir in têne bîrê. Ev in çend hevenav: »şagirt, xanî, evor, mase, can, bînahî, derzî, kerî, pez, kevir, dar, qencî, xelk, zîwan, keskesor, navro, girav, şeh«.

Serenav

37 Serenav ew navdêr e ko bi tenê kesekî, heywanekî an tiştekî dinimîne û xweserî wî kesî, wî tiştî an wî heywanî ye. Herwekî: *Sado, Bêlan, Herekol.* Ev navdêrên ha yeko yeko xweserî mirovekî, seyekî û çiyakî ne. Ev in çend serenav: *Hevind, Sîpan, Xabûr, Hindistan, Hezro, Kerevan, Zîn, Dêrgul, Kurdistan, Agirî, Cemşîd, Ferezende*

Guhêrbariya navdêran

38 Navdêrên zmanê kurdmancî ji du awirên têvel ve guhêrbar in: zayend û mêjer. Ev guhêrbariya navdêran bi tewangê têtе pê.

Bi gelemperî dûpaşê navdêran li gora zayend û mêjerê wan diguhêrin. Carina jî ev guhêrbarî bi guhêrina tîpeke rayekî têtе pê.

39 Zayend: Di zmanê kurdmancî de du zayend hene: mê û nêr.

Zayendê nêr

40 Navên mirov, heywanên nêr û navên tiştine nerihber yên ko kurdmancan ew nêr hesibandine, tev de ji zayendên nêr in. Wek: »Cemşîd, mêş, nêrî, ga, xanî, gir, Ferat, can, beran, Xurşîd, derî, êzing, hiş, çem, kevir, law, dirhav«.

Zayendê mê

41 Navên jin, heywanên mê û navên tiştine nerihber yên ko kurdmancan ew mê hesibandine, tev de ji zayendê mê ne. Mîna: »Sînemxan, jin, meh, dar, çêlek, mehîn, tifing, bizin, bîr, gol, pehnav, Herekol, Hezarom, co, enî, top, ejnû, Kurdistan«.

42 Navên heyberên rihber: Di heyberên rihber de, carina mê û nêrê wê heyberê bi bêjeyine cihê û biserxwe têne nîşan kirin.

Herwekî di bêjeyên jêrîn de:

bra	xweh
pismam	dotmam
bûra	diş
kur	keç
brazî	brazê
hesp	mehîn
yekane	mehû
beran	mih
nêrî	bizin
dîk	mirîşk

Lê gava ew heyber bi awayê jorîn, bi bêjeyine biserxwe û cihê ne binavkirî ne, hingê bêjeyên »mê« û »nêr« bi ser wan ve datînin û bi vî awayî zayendê wan, yanî mê û nêrên wan didin zanîn. Di vî şikilî de veqetandekek dikeve navbera bêjeya rayî û bêjeyên »mê« û »nêr«. Veqetandek bi xwe jî zayendê wan şanî dide. Wekî niho:

kewê nêr	kewa mê
kerê nêr	kera mê

pisingê nêr	pisinga mê
sîxurê nêr	sîxura mê
hirçê nêr	hirça mê
gurê nêr	gura mê
fîlê nêr	fîla mê
kevroşkê nêr	kevroşka mê

43 Qeyda jorîn, qeyda gelemper e. Yanî mê û nêrên heyberên rihber, nemaze heywanan, bi gelemperî bi vî awayî têne nîşan kirin. Lê kêm caran û ji vê qeydê der, bêjeyên »mê, nêr, dêl, mak, mang« dikevin pêşiya bêjeya rayî û bêî tu tiştî bi wan ve dibin; bêjeke nû û bihevketî ditînin pê. Hingê ew bêje bi hev ve têne nivîsandin. Herwekî: »nêreker, maker, mêkew, dêlegur, mange«

ŞANEK

Zayendê heywanekî, carina, bi veqetandek û tewangê jî tête nîşan kirin. Gava em dibêjin: »hespa min bîne« an »kera min bîne« xuyaye ko em qala mehîn û makerê dikin. Dîsan gava em dibêjin: »ez li hespê siwar bûm« an »ez li kerê siwar bûm« gelek kifş e ko heywanê ko em lê siwar bûne »mehîn« an »maker« e û ne »hespê nêr« û »kerê nêr« e.

44 Mana zayend: Bêjeyin hene ko gava mana wan diguhêre zayendê wan jî tête guhartin. Mesela »dar« gava bi mana dara heşîn e mê ye »Vê darê ji min re daweşîne«. Lê ev »dar« bi xwe gava bi mana darê hişk e nêr e »Vî darî ji min re bişkênîne«.

45 Di zayendê hin navdêrên ko tiştine nerihber dinimînin kurdmanc ne yek in. Hinan ew nêr, hinên din ew mê hesibandine. Ji wan bêjeyan tiştê ko heta niho me kari bû em bisenifînin bêjeyên jêrîn in. Heye ko hinên din jî peyda bibin: *çax, wext, mixdar, qeder, sîng, kursî, balgih, xeber.*

Wezîfeyên navdêrê

46 Navdêr di komekê de gelek wezîfan dibînin.
Bi kurtî ên bingehîn ev in:

Kirar:	Soro îro ji bajêr hat.
Bireserê lêkerê:	Min Soro dît.
	Min ji Soro re got.
Bireserê navdêreke din:	Kitêba Soro nû ye.
Pêveberê lêkerê:	Xerîbî ne tu çek e.

Mêjer

47 Di gramêrê de mêjer ew xweseriya navdêran e ko navdêr pê heybereke bi tenê an heyberine gelêr dikarin şanî bidin. Bi gotinên din mêjer yekejmarî û gelejmariya navdêran şanî me dike û em pê dizanin gelo di qisetê de qala heybereke bi tenê dikin an ji yekê bêtir. Heke navdêr heybereke bi tenê dinimîne hingê ew yekejmar e; û heke ji yekê bêtir dinimîne hingê ew gelejmar e.

Yekejmar

48 Navdêr yekejmar e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimîne yekî bi tenê raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn yekejmar in: »Mîr hat. Ez hespekî dibînim. Ez çiyayê bilind dibînim«. Ji ber ko ew ji mîran mîrekî, ji hespan hespekî û ji çiyan çiyakî bi tenê şanî dikin.

Gelejmar

49 Navdêr gelejmar e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimîne ji yekî bêtir raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn gelejmar in: »Mîr hatin. Ez hespina dibînim. Ez çiyayên bilind dibînim«. Ji ber ko ew ji mîran çend mîran, ji hespan çend hespan û ji çiyan çend çiyan şanî dikin.

50 Herwekî ji mîsalên madeyên 48 û 49 dixuye di zmanê kurdmancî de yekejmarî û gelejmariya navdêran bi çend awayên têvel xuya dibin. Ew nemaze ji mêjerê lêker, tewang û veqetandekê dixuyin.

Yekejmar	**Gelejmar**
Ev mehîn e.	Ev mehîn in.
Min mehîn dît.	Min mehîn dîtin.
Ez mehînê dibînim.	Ez mehînan dibînim.
Ez mehînekê dibînim.	Ez mehînina dibînim.
Ezê ji te re mehîneke qenc [peyda bikim.	Ezê ji te re mehînine [qenc peyda bikim.

Ev kurê kê ye?	Ev kurên kê ne?
Mehînê xwar.	Mehînan xwar.
Tu vî hespî dibînî?	Tu van hespan dibînî?

Gelejmariya serenavan

51 Ji ber ko serenav xweserî tiştekî, mirovekî an heywanekî ne, û pê bi tenê ew bi nav dibin, di rastiyê de serenav tucaran nabin gelejmar. Lê bi mecazî û ji bo mîsalê bi gelejmarî têne gotin. Herwekî: *Ez ji te re Melayên Cizerî, Ehmedên Xanî û Feqehên teyran ji kû peyda bikim. Tu di beyabanên bêdar û belg de li Bîngolan digerî.*

Tewang

52 Zimanê kurdmancî zmanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê de dikevin ê, û wezîfa ko li ser xwe digirin têne tewandin û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin.

53 Ji birên qisetê bi tenê ên guhêrbar têne tewandin. Ên neguhêrbar tucaran nayine tewandin û ew hergav weke xwe dimînin.

54 Bi gelemperî bêje di qisetê de an kirar an bireser in. Gava ew kirar in weke xwe dimînin û gava dibin bireser hingê têne tewandin.

Tewanga her birê qisetê herçend yekcar ji hev cida nebin jî ew kêm û zêde ji hev biferq in. Tewanga her birî di cih de û di devera wê de dê bête gotin.

Tewanga navdêran

55 Navdêr, hevenav bin serenav bin, li gora mêjer û zayenden xwe têne tewandin. Bi gelemperî û di yekejmariyê de navdêrên nêr bi »î«-yê û navdêrên mê bi »ê«-yê û gelejmara herdiwan bi »an«-ê têne tewandin. Ev parkît bi paşiya navdêran ve dibin.

Hesp hat.	Hesp hatin.
Mehîn hat.	Mehîn hatin.

Di komekên jorîn de navdêrên »hesp« û »mehîn« ne hatine tewandin. Ji ber ko ew her du jî di wan komekan de kirar in û kirar nayine tewandin. Lê ev navdêr bi xwe di komekên jêrîn de hatine tewandin. Ji ber ko tê de êdî ne kirar lê bireser in.

Ez hespî dibînim.	Ez hespan dibînim.
Ez mehinê dibînim.	Ez mehînan dibînim.

Di mîsalên jorîn de navdêr hemî bireserê lêkerê ne. Lê navdêr bireserê navdêreke din jî dibin. Hingê jî navdêr têne tewandin. Herwekî:

Ev goştê çêlekê ye. Ava golê şêrîn e. Di çiyayên Kurdistanê de her texlît dehbe û cenawir hene. Gola Wanê goleke spehî ye.

ŞANEK

Di nav bêjeyên ko bi »an«-ekê temam dibin, di hinan de ev »an« ji esil û rayekê bêjeyê ye. Mîna: *Rewan, baran, peyman, garan, kevan, diran h.d.* Lê di hinên din de ev »an« bi xwe, tewang e, û ji ber sebebekê bi wan ve bûye. Mîna: *Serhedan, Botan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan h.d.* Ji lewre ev bêjeyên ha bi tu awayî nikarin bêne tewandin. Ji ber vê yekê herwekî mirov dibêje »Ez ji Rewanê têm« nikare bibêje »Ez ji Botanê têm«. Ji ber ko eslê bêjeyê »bot« e, »an« ko pê ve bûye tewanga gelejmarê ye. Ji xwe gava em Botan dibêjin mexsed »cihê« an »eşîrên Botan« e. Bêjeya »bot« bireserê cih û eşîrê ye û ji lewre hatiye tewandin û bûye »Botan«. Mîna bêjeya »dar« gava dibe bireserê bêjeke din tête tewandin. Herwekî: »pêlên daran«. Bêjeyên wek *Serhedan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan, Soran* jî mîna wê ne û tev de yek hawî ne.

Di vê navê de bêjeya »gulan« rexma ko ji vî cisnî ye tête tewandin. Bi rastî eslê vê bêjeyê »meha gul, meha gulan« e; yanî »an« tewang e. Ji lewre diviya bu »gulan« ne hata tewandin. Lê ev bêje ji qeydê der û bi awarteyî careke din tête tewandin û dibe gulanê« û li şûna ko bibêjin »meha gulan« dibêjin »meha gulanê«. Ji ber vê yekê »an«-a gulanê divêt ji eslê bêjeyê bête hesibandin.

56 **Awarte:** Bi tenê û ji qeydê der di lêkerên gerguhêz û di zemanê wan ên borî de bireserên wan weke xwe dimînin û ji berevajî ve kirarên wan têne tewandin. Ji lewre, di komekên jêrîn de rexma ko bêjeyên: »Zîn, hesp, çêlek, zarok« kirar in, hatine tewandin û bêjeyên; »Sîsin, ceh, pencere« yên ko bireser in weke xwe mane û ne hatine tewandin.

Zînê Sîsin dît. Hespan ceh xwar.
Çêlekan giha xwari bû. Zarokan pencere şkênand.

57 Herçî navdêrên nêr in heke di wan de tîpên »ê« û »a« hene ev navdêr dikarin bi guhartina van tîpan bi »ê«-kê jî bêne tewandin. Herwekî

di van komekan de: »Soro ji kêvir ket. Gurgîn çû êş. Balafir ber bi ezmên firî. Ez li hêsp siwar bûm. Ferzo ji bajêr têt. Kî li ser bên bû? Em ji xênî derketin«.

Bi vê qeydê ve, divêt di qisetê de hin navdêrên nêr bê tewang bimînin. Ji ber ko di hemî navdêrên nêr de dengdêrên »e« û »a« peyda nabin. Ji lewre û li nik kurdmancên ko bi vê qeydê ve diçin bêjeyen wek: »kum, goşt, dil, hiş, mirov, mêrik, gir, kur, mîr, mêr, gund« nayine tewandin, ji ber ko di wan de ne »e« ne jî »a« heye. Ji ber vê yekê gava ew di qisetê de dibin bireser jî weke xwe dimînin. Piştî ko ev qeyda di zmên de cih bûye navdêrên bi »e« û »a« jî di qisetê de bê tewang hatine gotin.

Ji lewre herwekî mirov dikare bibêje »ez ji kevirî *an* kêvir ketim« dikare bibêje jî »ez ji kevir ketim« û bêjeya »kevir« netewîne.

ŞANEK

Ji raveka jorîn dixuye ko di navdêrên nêr de meyildariya zimên ber bi terikandina tewanga wan a yekejmar e; nemaze şiklê pêşîn. Ji lewre her sê şiklên jêrîn rast in

Soro kevirî tavêje.
Soro kêvir tavêje.
Soro kevir tavêje.

Gurgîn çû aşî.
Gurgîn çû êş.
Gurgîn çû aş.

Balafir ber bi ezmanî firî.
Balafir ber bi ezmên firî.
Balafir ber bi ezman firî.

Ez li hespî siwar bûm.
Ez li hêsp siwar bûm.
Ez li hesp siwar bûm.

Ferzo ji bajarî têt.
Ferzo ji bajêr têt.
Ferzo ji bajar têt.

Kî li ser banî bû?
Kî li ser bên bû?
Kî li ser ban bû?

Em ji xaniyî derketin.
Em ji xênî derketin.
Em ji xanî derketin.

58 Gava çend navdêr didin pey hev herwekî mirov dikare wan navdêra li gora mêjer û zayendê heryekê yek bi yek bitewîne, dikare bi tewandina hinekan jî bes bike.

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek zayendî ne; lê tev de ji yek mêjerî ne. Tewandina navdêra paşîn bes e. »Ez hesp û mehînê dibînim. Ez hesp û mehînan dibînim. Hesp û mehînan xwar«.

Navdêrên ko dane pey hev, ne ji yek mêjerî ne. Her navdêr cihê û li gora mêjer û zayendê xwe têtе tewandin. »Ez mihê û bizinan dibînim. Ez hêsp û mehînan dibînim. Mihê û bizinan xwar«.

Navdêrên ko dane pey hev ji yek mêjerî û tev de yekejmar in, lê ew ne ji yek zayendî ne; û navdêra paşîn nêr e. Ji ber ko di tewangê de esil navdêra paşîn e û hikim li mêjerê wê ye heke ew ne hatiye tewandin navdêra mê jî bê tewang dimîne. »Ezê herim keçik û kurik bibînim. Tu Rewşen û Felemêz dibînî?«

ŞANEK: 1

Herçî navdêrên ko bi »e« an bi »a«-yê temam dibin, çi mê çi nêr, ji ber kurtiyê, di yekejmarê de bi guhartina van tîpan bi »ê«-kê jî têne tewandin. Di gelejmarê de ew »e« û »a« yekcar dikevin û »a«-ya tewangê dikeve şûna wan.

Li ser maseyê	Li ser masê
Li ser maseyan	Li ser masan

Ber bi çiyayî	Ber bi çiyê
Ber bi çiyayan	Ber bi çiyan
Çirayê vemirîne	Çirê vemirîne
Perdeyê rake	Perdê rake
Perdeyan rake	Perdan rake

ŞANEK: 2

Bêjeyên weke *Frense, Sûriye, Emêrîke, Efrîqe h.d.* yên ko bi »e«-kê temam dibin, heke ew bi guhartina wê »e«-yê bi »ê«-kê ne hatine tewandin û ketine bin hikmê qeyda gelemper ew »e« bi »a«-kê diguhêre û ew bêje bi awayê jêrîn têne tewandin: »Ji Sûriyayê, ji Frensayê, ji Emêrîkayê, ji Efrîqayê. Lê şiklê din, yanî şiklê: Ji Frensê, ji Sûriyê, ji Emêrîkê, ji Efrîqê« siviktir e.

Bireserê navdêrê

59 Navdêr di komekê de an bi tena xwe ne, an bêjeyeke din bi wan ve bûye û hevaltiya wan dike. Ji wê bêjeyê re bireser dibêjin; ji ber ko ew mana navdêrê diedilîne û dibe serî.

Bireserên navdêran, li gora cisnên xwe li pêşî an li paşiya navdêran têne zede kirin.

Bireser gava dikevin pêşiya navdêran bêî tu tiştî bi wan ve dibin: *ev keçik, kîjan mirov, çar xanî, hin çiya, çend kitêb, deh bizin, van zarokan*

Lê gava navdêr bi xwe li pêş e û bireser dane pey, hingê veqetandekek dikeve navbera navdêr û bireser û wan digihîne hev: *Beriya Mêrdinê, hespê beza, mehîna spehî, çiyayê bilind, pehnava çiyê, newala kûr, rêke dirêj, stûna xênî, destê bi tenê, dara şikestî, xencera min*

60 Navdêrek dikare çend bireseran bibe. Hin ji wan dikarin bikevin pêşî hinên din jî paşiya navdêrê. Bireserên ko ketine pêşiya navdêrê û yên ko dane pey wê ji alîkî û tev de bireserên navdêrê ne û ji aliyê din ew bi xwe bireserên hev in: *Min çend kitêb hene. Min çend kitêbên qenc hene. Ev xencera min e. Ev xencera xulamê min e. Ev xencera xulamê pismamê min e. Ev xencera xulamê cîranê pismamê min e.*

Veqetandek

61 Veqetandek bêjeke kiçik e ko dikeve paşiya navdêran û paşiya wan bêjeyên ko li şûna navdêran radibin û wan dinimînin.

Veqetandek carina di pêşiya rengdêran de jî peyda dibin.

Veqetandek bi gelemperî mêjer û zayendê navdêrê şanî didin û navdêr ji wekhevên wê vediqetînin.

Bi pêvebûna veqetandekê navdêr carina binavkirî û carina jî nebinavkirî dibin.

62 Di zimanê kurdmancî de du texlît veqetandek hene: veqetandekên binavkirî û veqetandekên nebinavkirî.

Veqetandekên binavkirî

63 Veqetandekên binavkirî dikevin paşiya navdêrên ko bireserek bi wan ve bûye û ev veqetandek wan navdêran binavkirî dikin. Ev navdêr bi vî awayî ji wekhevên xwe vediqetin, dibin xweserî kesekî, tiştekî, an wesfekî wan didin zanîn. Veqetandekên binavkirî sisê ne: *ê, a, ên.*

Ê — Ji bo yekejmara zayendê nêr.

Hespê Soro, çiyayê bilind, deriyê malê, dîwarê hewşê, pismamê min, mirovê qenc, kewê nêr.

A — Ji bo yekejmara zayendê mê.

Mehîna Cemşîd, newala kûr, dotmama wî, jina delal, stûna stûr, ava tenik, destmala Sînemê, kewa mê.

ÊN — Ji bo gelejmara her du zayendan.

Hespên Soro, Çiyayên bilind, deriyên malê, dîwarên hewşê, pismamên

min, mirovên qenc, kewên nêr, mehînên Cemşîd, newalên kûr, dotmamên wî, jinên delal, stûnên stûr, avên tenik, destmalên Sînemê, kewên mê.

Bi rastî, gava em »Hespê Soro« dibêjin, vî hespî bi veqetandeka »ê« ji hespên din vediqetînin, û xweserî Soro dikin. Bi vî awayî em dizanin ko ev hesp hespê mirovekî ye ko navê wî Soro ye û ew ne hespê Gurgîn, Felemêz an mirovekî din e.

Dîsan di mîsala »Çiyayê bilind« de jî bi veqetandekê wesfê bilindbûnê em pê ve dikin û vî çiyayî ji wekhevên wî û nemaze ji çiyayê nizim cida dikin û ferqa bilind û nizimbûnê dixin navbera wan.

Gava em »dotmama wî« dibêjin, em çêlî wê dotmamê dikin ko ne ya min e, ne jî ya te ye, lê ya wî mirovî ye ko ew bi me her diwan nas e.

Veqetandek di pêşiya rengdêran de

64 Gava veqetandeka binavkirî dikeve pêşiya rengdêrekê ew li şûna wê navdêrê radibe ko berî bîstekê çêl li wê kirine û ew bi xeberbêjan nas e. Hingê veqetandek mîna pronavekî navdêrekê dinimîne. Herwekî di bersivên komekên jêrîn de:

— Tu kîjan kumî dixwazî?
— Ez ê gewir dixwazim (yanî kumê gewir dixwazim).

— Tu kîjan destmalê dixwazî?
— Ez a sor dixwazim (yanî destmala sor dixwazim).

Di gelejmarê de:

— Ez ên gewir dixwazim (yanî kumên gewir dixwazim).
— Ez ên sor dixwazim (yanî destmalên sor dixwazim).

Veqetandekên nebinavkirî

65 Veqetandekên nebinavkirî dikevin paşiya wan navdêrên ko ji wekhevên xwe hatine veqetandin, lê ne hatine bi nav kirin û bi biservebûna

van veqetandekan kesine an tiştine nebinavkirî şanî didin. Du texlît veqetandekên nebinavkirî hene: 1) yên ko dikevin paşiya wan navdêrên ko hêj tu bireser bi wan ve nebûne, 2) yên ko dikevin paşiya wan navdêran ko bireserek daye pey wan.

66 EK, EK, IN

EK — Ji bo yekejmara zayendê nêr.
EK — Ji bo yekejmara zayendê mê.
IN — Ji bo gelejmara her du zayendan.

Ev veqetandek dikevin paşiya wan navdêrên ko hêj bi serê xwe ne û tu bireser bi wan ve ne bûne.

Hespek hat.	Hespin hatin.
Mehînek hat.	Mehînin hatin.
Min hespek dît.	Min hespin dîtin.
Min mehînek dît.	Min mehînin dîtin.
Ev hespek e.	Ev hespinin in.
Ev mehînek e.	Ev mehînin in.

Gava em »hespek hat« dibêjin, em vî hespî ji wekhevên wî vediqetînin, lê em wî nadin zanîn gelo ev kîjan hesp e? an hespê kê ye? Em wî bi vê veqetandekê nebinavkirî dikin.

Wezîfa veqetandeka nebinavkirî ji hevdûbêja jêrîn xweş tête seh kirin. Kur ji bavê xwe re dibêje:

— Ezbenî min dît, hespek hat û kete hewşê.
Bav: – Gelo ew kîjan hesp e? an hespê kê ye?
Kur: – Nizanim ez herim lê fedkirim.

Kur diçe, lê fedkire, vedigere û ji bavê xwe re dibêje:

— Ezbenî, hespê ko hat hespê kumêt e; an, hespê ko hat hespê Gurgîn e.

Bêdiro, hetanî ko kur ne çû û li hêsp fenekirî, kur û bav bi tenê diza-

nîn ko yek ji heywanên ko jê re hesp dibêjin hatiye û ketiye hewşê. Lê ji ber ko tu wesfê wî bi wan ne nas e, ew hesp bi wan ne binavkirî ye û ew nizanin ew kîjan hesp e. Ji lewre veqetandekeke nebinavkirî pêve ye. Lê piştî ko kur diçe lê fedkire û vedigere, hingê kur û bav dizanin ko ew hesp, hespê kumêt e; an hespê Gurgîn e. Bi gotinên din ew hesp bi wan binavkirî dibe. Ji xwe veqetandeka binavkirî »ê« pê ve bûye.

ŞANEK

Heke navdêrine ji yek mêjerî dane pey hev veqetandekeke bi tenê besî wan e.

Hesp û mehînek hatin. Min keç û kurek hene.

Li şûna:

Hespek û mehînek hatin. Min keçek û kurek hene.

Lê heke navdêr ne ji yek mêjerî ne, hinên wan yekejmar û hinên din gelejmar in, hingê heryek ji wan cihê cihê veqetandeka xwe a xweser dibe.

Hespek û mehînin hatin. Min keçek û kurin hene.

67 EKÎ, EKE, INE

EKÎ — Ji bo yekejmara zayendê nêr.
EKE — Ji bo yekejmara zayendê mê.
INE — Ji bo gelejmara her du zayendan.

Ev veqetandek dikevin paşiya wan navdêrên ko bireserek daye pey wan.

Hespekî delal hat.	Hespine delal hatin.
Mehîneke delal hat.	Mehînine delal hatin.
Hespekî sor hat.	Hespine sor hatin.
Mehîneke sor hat.	Mehînine sor hatin.

Gelek eşkere ye ko gava em »hespekî delal« an »hespekî Soro« dibêjin, ev gotin ne bi mana »hespê delal« û »hespê Soro« ye. Em li mîsala »hespekî Soro« hûr bibin. Di gotina »hespê Soro« de qala hespekî welê dikin ko bi her awayî bi me nas e. Lê gava »hespekî Soro« dibêjin ev hesp bi me bi temamî ne nas e. Bi tenê em dizanin ko ew, hespek ji hespên Soro ye. Lê ew kîjan hespê Soro ye; em pê nizanin.

Veqetandekên nebinavkirî di pêşiya rengdêran de

68 Veqetandekên nebinavkirî jî wek ên binavkirî, carina dikevin pêşiya rengdêran. Hingê şiklê wan ev e: *î, e, en.*

Hespekî min î qenc hebû. Hespine min en qenc hebûn. Mehîneke min e qenc hebû. Mehînine min en qenc hebûn.

Çend mîsalên din:

Ez çûme derên çeman, çem en ser in.
Zozanên bavê te bilind in, berf û baran lê dibarin.
Kurê Haco ê mezin î xwenda. Hespekî min î sor hebû.

ŞANEK

Gava çend navdêr bi bireserekî ve girêdayî ne û ew hemî ji yek mêjerê ne, ji yek zayendî nebin jî, mirov dikare wan navdêran bi yek veqetandekê bi bireserî ve girêbide. Veqetandek ji zayendê navdêra paşîn têtе bijartin, yanî heke navdêra paşîn nêr e, veqetandek nêr û heke ew mê ye, veqetandek jî mê ye. Herwekî li şûna ko mirov bibêje: »Meta min û mamê min hatine« »pismamê min û dotmama min hatine«. Mirov dikare bibêje: »Met û mamê min hatine«. »Pismam û dotmama min hatine«.

Çend mîsalên din: Hesp û mehîna Lezgîn. Keç û kurekî min hene. Mih û bizinine zozanan.

69 Gava ji yekê bêtir bireser bi navdêrekê ve dibin û ew bireser tev de navdêr û pey hev bireserên hev in hingê her yekî wan li gora mêjer û zayendê xwe veqetandekeke cihê dibe:

Ava me şêrîn e.
Ava kaniya me şêrîn e.
Ava kanîke me şêrîn e.
Ava kanîne me şêrîn e.
Ava kaniya gundê me şêrîn e.
Ava kanîke gundê me şêrîn e.
Ava kanîne gundê me şêrîn e.
Ava kanîke gundekî me şêrîn e.
Ava kaniyên gundê me şêrîn e.
Ava kaniya gundê cîranê me şêrîn e.
Ava kanîke gundê cîranê me şêrîn e.
Ava kaniyên me şêrîn e.
Avên kaniyên me şêrîn in.

Lê heke di nav wan bireseran de rengdêrek heye, hingê û ji ber ko rengdêr ji bêjeyên neguhêrbar e, û ji lewre tu veqetandek pê ve nabe, veqetandeka navdêra ko rengdêr bireserê wê ye dikeve pêşiya wê rengdêrê û wê bi navdêra xwe ve girêdide. Herwekî: gava em »kurê Haco ê mezin« dibêjin »ê«-ya ko ketiye pêşiya rengdêra »mezin ji »ê«-ya ko bi »kur« ve bûye pê ve ne tu tişt e. Yanî yê ko mezin e, kur e, û ne »Haco« ye. »Haco« biwa meê hingê bigota »Kurê Hacoyê mezin«. Heke me çêlî keçên Haco bikira hingê meê »a mezin« bigota, ji ber ko veqetandeka keçê »a« ye. »Keça Haco a mezin« Lê heke me mezinbûn bi aliyê Haco ve da hingê veqetandeka »Haco« pê ve dibe: »Keça Hacoyê mezin«.

Çend mîsalên din: *Tifinga min a dirêj. Hespekî min î xurt û beza hebû. Kitêba Hevind a peritî. Mehîna min a kumêt.*

Tewanga veqetandekê

70 Ji veqetandekên nebinavkirî »ek, ek, in« gava dikevin paşiya bêjeyên ko di qisetê de ne kirar lê bireser in, ew jî weke navdêran, têne tewandin û dibin: *ekî, ekê, ina.*

Hespek hat.	Ez hespekî dibînim.
Hespin hatin.	Ez hespina dibînim.

Mehînek hat.	Ez mehînekê dibînim.
Mehînin hatin.	Ez mehînina dibînim.

ŞANEK

Ji qeydê der û di hin cihên Kurdistanê de veqetandeka »in« carina bi »î« û »ê«-yê jî têtе tewandin; herçend »in« veqetandekeke gelejmar e û parkîtên »î« û »ê« yekejmar in. Mesela: Li şûna »goştî bide min« û »avê bide min« »goştinî bide min« û »avinê bide min« dibêjin.

71 Gava navdêr bi dengdêrekê temam dibin, dema ko veqetandek bi wan ve dibin mirov dikare hin tîpên ko navdêr û veqetandekê bi hev re girêdidin ji navê bêxe û wan kutebir bike. Herwekî li şûna ko mirov bibêje:

»Piyekî, xaniyekî, çirayekê, maseyekê, coyekê, xwesûyekê, kursiyek, xaniyine, maseya min«.

Dikare bibêje: »Pêkî, xanîkî, çirakê, masekê, cokê, xwesûkê, kursîk, xanîne, masa min«.

ŞANEKA TARÎXÎ

Gramêra frensizî dibêje ko zmanê frensizî veqetandekên xwe ji pronaveke latînî girtine. Gelo me yên xwe, ev bêjeyên hûr, ji kû girtine?

Li gora tedqîqatên ko heta niho min çêkirine, me jî veqetandekên xwe ji hin pronavan girtine, lê ne ji pronavine biyanî, ji pronavine xwe.

Belê, veqetandekên me ên binavkirî ji pronavine me ên işarkî bi der hatine. Herwekî pêşdetir dê bête gotin »yê, ya, yên« pronavine işarkî ne û veqetandekên me ên binavkirî ji wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşiya navdêrekê û dibûn rengdêrine işarkî »di«-yek dikete navbera wan û navdêrê. Mesela gotina »Hespê Soro« di eslê xwe de »Hespê di Soro« (1) ye.

---

(1) Ev şikil hetanî îro di hin cihên Kurdistanê de peyda dibe. Lê tenê di gelejmarê de têtе gotin. Yanî li şûna ko bibêjin »hespên Soro« »hespê di Soro« dibêjin û gelejmariya hespan bi »di«-yê didin zanîn.

Bêdiro, pronavên »yê, ya, yên« di şiklê »ê, a, ên« de bûne veqetandek û bi paşiya navdêran ve zeliqîne; carina jî ketine pêşiya rengdêran. Yanî »Ev hesp yê Soro ye« bûye »Ev hespê Soro ye«. Mîsalên jêrîn biserveketina veqetandekên kurdmancî bi temamî şanî didin.

Ev hesp, yê di Soro ye.	Ev hesp, yê Soro ye.
Ev, hespê di Soro ye.	Ev, hespê Soro ye.
Ev hesp, yên di Soro ne.	Ev hesp, yên Soro ne.
Ev, hespên di Soro ne.	Ev, hespên Soro ne.
Ev mehîn, ya di Soro ye.	Ev mehîn, ya Soro ye.
Ev, mehîna di Soro ye.	Ev, mehîna Soro ye.
Ev mehîn, yên di Soro ne.	Ev mehîn, yên Soro ne.
Ev, mehînên di Soro ne.	Ev, mehînên Soro ne.

Herçî veqetandekên me ên nebinavkirî, me şiklên wan ên pêşîn, yanî yên ko bi navdêreke bê bireser in, me ew ji pronavên xwe ên nebinavkirî »yek« û »hin« girtine û ew xistine paşiya navdêran.

Yek hesp hat.	Hespek hat.
Hin hesp hatin.	Hespin hatin.
Yek mehîn hat.	Mehînek hat.
Hin mehîn hatin.	Mehînin hatin.

Herçî veqetandekên nebinavkirî, yên ko dikevin paşiya navdêrên ko bireserek bi wan ve bûye, di pêkanîna wan de, pronavên işarkî û ên nebinavkirî arîkariya hev kirine û ew anîne pê. Herwekî ji mîsalên jêrîn dixuye.

Ev hespek yê di Soro ye.	Ev hespek yê Soro ye.
Ev, hespekî di Soro ye.	Ev, hespekî Soro ye.
Ev hespin yên di Soro ne.	Ev hespin yên Soro ne.
Ev, hespine di Soro ne.	Ev, hespine Soro ne.

Ev mehînek ya di Soro ye.	Ev mehînek ya Soro ye.
Ev, mehîneke di Soro ye.	Ev, mehîneke Soro ye.
Ev mehînin yên di Soro ne.	Ev mehînin yên Soro ne.
Ev, mehînine di Soro ne.	Ev, mehînine Soro ne.

Bi vî awayî veqetandekên me ên binavkirî û ên nebinavkirî hatine pê.

Di vê ravekê de kêmahiyek dikeve ber çavan. Gelo »î« û »e«-yên ko di gotinên »hespekî Soro« û »mehîneke Soro« de têne dîtin, ji kû peyda bûne. Divêt ev tehsîra tewanga pronava nebinavkirî »yek« bibe. Ji xwe ev pronav di eslê xwe de jimarnav e û jimarnav navdêran ditewîne û ev tewang yanî û tewanga jimarnavan di ser hemî tewangên din re tête girtin. Heke me ew gotin vegerandine şiklê jêrîn ew »î« û »e« jî bi der tên.

Yek hespî Soro. Yek mehîne Soro.

Herçî »e«-ya »hespine Soro« ye ev »e« di eslê xwe de »en« bû û »n« jê ketiye û li şûna »hespinen Soro« îro dibêjin »hespine Soro«. Ji xwe »n« işareta gelejmariyê; û ji ber ko di »ine« de »n« ek heye ji xwe jê re hewce namîne.

Pronav

72 Pronav ew bêje ye ko dikeve şûna navdêrê. Pronav, mêjer û carina jî zayendê navdêrê dide zanîn. Ji hêla din pronav wezîfeyên navdêra ko dinimîne li xwe digere û wan ditîne cih.

Di komekên jêrîn de: »Zimanê lalekî ji yê virkerekî çêtir e. Du diz ji bo kerekî dizî pev diçûn; yekî dixwest wî bifroşe, ê din dixwest pê karekî bike. Bayê zozanan ji yê deştê xweştir e. Ewê ko hat birayê min bû.« Bêjeyên »yê, yekî, wî, ê, pê, yê, ewê« pronav in. Ji ber ko ew ketina şûna navdêrên: »zimanê, dizekî, kerî, dizê, bi kerî, bayê, mirovê«.

Bêdiro, heke me ev navdêr vegerandine şûna wan pronavan ew komek dikevin şiklên jêrîn. »Zimanê lalekî ji zmanê virkerekî çêtir e. Du diz ji bo kerekî dizî pev diçûn; dizekî dixwest kerî bifroşe, dizê din dixwest bi kerî karekî bike. Bayê zozan ji bayê deştê xweştir e. Mirovê ko hat birayê min bû«.

Zayendê pronavan

73 Pronavan sê zayend hene: *mê, nêr* û *nêtar.*

Pronavên nêr

Pronavên nêr ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên nêr. *Lêzgîn got, wî got.*

Pronavên mê

Pronavên mê ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên mê. *Qeşemê got, wê got.*

Pronavên nêtar

Pronavên nêtar ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên her du zayendan û li gora zayendê navdêra ko dinimînin dikarin carina nêr û carina jî mê bêne hesibandin. *Lezgîn hat; ew hat. Qeşem hat; ew hat.*

74 Di zmanê kurdmancî de şes texlît pronav hene.

1. Pronavên kesîn
2. Pronavên işarkî
3. Pronavên girêkî
4. Pronavên pirsiyarkî
5. Pronavên nebinavkirî
6. Pronavên xwedîn

Pronavên kesîn

75 Ji van pronavan re pronavên kesîn dibêjin. Ji ber ko ew, nemaze, dikevin şûna kesan û wan dinimînin. Di qisetê de sê kes hene ko dikevin axaftinê. Ê xeberbêj, yanî yê ko daxêve, û yê ko pê re tête axaftin û kesê ko axaftin li ser wî ye. Di gramêrê de ji wan re kesê pêşîn, kesê diwim û kesê seyim dibêjin.

1. Kesê pêşîn. Yê ko daxêve: *ez, min, em, me, xwe.*

2. Kesê diwim. Yê ko pê re tête axaftin: *tu, te, hon, we, xwe.*

3. Kesê seyim. Yê ko di axaftinê de qala wî dikin: *ew, wî, wê, ew, wan, xwe, ê.*

Ji van pronavan »wî« nêr, »wê« mê û ên mayin tev de, yanî: »ez, min, tu, te, ew, em, me, hon, we, wan, xwe, ê« nêtar in.

76 *Pronavên lihevxistî.* Ji pronavên nêtar hinên din hene ko ji wan re pronavên lihevxistî dibêjin. Ji ber ko ew bi lihevxistina daçek û pronavekê têne pê.

77 Pronavên kesîn du tofên biserxwe ditînin pê: *pronavên kirar, pronavên bireser.*

Pronavên kirar bi gelemperî dikevin şûna wan navdêrên ko di qisetê de kirar in. Herçî bireser dikevin şûna navdêrên ko di qisetê de bireser in.

Ji lewre ev pronavên ha nayine tewandin. Ji ber ko şiklên wan ên bireser şiklên wan ên tewandî ne. Lê herçî pronavên ko şiklên wan ên tewandî nînin, gava ew, di qisetê de dibin bireser, wek navdêrên ko dinimînin têne tewandin.

Pronavên kirar	Pronavên bireser
ez	min
tu	te
ew	wî, wê
em	me
hon	we
ew	wan

78 **Awarte:** Herwekî di mada (56) de hate gotin, navdêr gava kirarê lêkereke gerguhêz in, di zemanên xwe ên borî de weke bireseran têne tewandin û ji bervajî ve bireserên wan ên sererast weke xwe dimînin. Ji ber vê yekê di van lêkeran de pronavên kirar bi ên bireser diguhêrin û her yeke wan dikeve şûna a din; yanî pronavên kirar dibin bireser û ên bireser dibin kirar.

Ji lewre lêkerên wek »gotin, xwarin, xistin« di zemanên xwe ên borî de bi pronavine bireser têne çevandin û bireserên wan ên sererast bi pronavine kirar têne nimandin. Herwekî: *min got, te xwar, wî xist, we got, wê xwar, wan xist, me xwar.* Çend mîsal:

Zinê Sîsin dît.	Wê ew dît
Hespan ceh xwar.	Wan ew xwar.
Min qelem ji destê xwe xist.	Min ew ji destê xwe xist.
Cîranan em dîtin.	Wan em dîtin.
Soro ez xapandim.	Wî ez xapandim.

Pronavên kirar

79 Pronavên kirar dikevin pêşiya lêkeran û lêker rast bi rast didin pey wan: *ez hatim, ew çû, min dixwar, wan goti bû, ezê herim, min dê bigota.*

80 Carina û gava di komekê de bireserin hene, hinekên wan dikevin navbera pronav û lêkerê: *Îro, ez ji Farqînê hatim. Ew dihî berî nîvro çû Diyarbekrê. Min nan xwar. Ez diçim nêçîrê. Wan ev tişt ji min re di koçka we de goti bû. Ezê sibê bi birayê xwe re herim dibistanê.*

81 Heke lêkerê du kirarên têvel hene pronavên ko dinimînin, li gora rêza kesên xwe didin pey hev, yanî kesê diwim dide pey kesê pêşîn û kesê seyim dide pey kesê diwim. Ji bo xurt kirina gotinê piştî pronava didowan pronaveke gelejmar û ji kesê pronava pêşîn tête hildan. Ji lewre nabe ko mirov bibêje: ew û ez em hatin« lê divêt bibêje »ez û ew em hatin« an »ez û ew hatin«. Ji ber ko »ew« ji kesê seyim û »ez« ji kesê pêşîn e. Çend mîsalên din: *Tu û ew hon çûn. Ez û tu emê herin. Te û wî we bigota. Min û te me ne xwar. Ez û ew em rabûn.*

82 Heke di komekê de çend lêker, lê kirarekî bi tenê heye hingê ne gerek e ko di pêşiya her lêkerê de pronav bête tekrar kirin. Ji lewre, li şûna ko mirov bibêje: »ew çû, ew lê fedkirî û ew vegeriya« dikare bibêje û spehîtir e ko bêje: »ew çû, lê fedkirî û vegeriya«. Dîsan li şûna »Min kirî, min firot û min pê kar kir« mirov dikare bibêje: »min kirî, firot û pê kar kir«.

83 Lê heke lêker tev de ne ji yek cisnî ne, yanî hin gerguhêz û hin jî negerguhêz in; hingê li gora pêkhatina komekê lêker bi pronavekê an bi didowan têne çevandin.

84 Pronava lêkera negerguhêz di pêşiyê de:

Vêca her lêker li gora cisnê xwe bi pronavine cihê têne çevandin. Yanî lêkerên negerguhêz bi pronavên xwe û ên gerguhêz bi yên xwe. Û herwekî ji mîsalên jêrîn dixuye hevokên ko lêkeran ew anîne pê dikarin bi hevgihanga »û«-yê bi hev re bêne girêdan:

Ez çûm, min ji xwe re hespek kirî.
Ez çûm û min ji xwe re hespek kirî.

Tu çûyî, te ji xwe re hespek kirî.
Tu çûyî û te ji xwe re hespek kirî.

Ew çû, wî ji xwe re hespek kirî.
Ew çû û wî ji xwe re hespek kirî.

Em çûn, me ji xwe re hespek kirî.
Em çûn û me ji xwe re hespek ki¦ î

Hon çûn, we ji xwe re hespek kirî.
Hon çûn û we ji xwe re hespek kirî.

Ew çûn, wan ji xwe re hespek kirî.
Ew çûn û wan ji xwe re hespek kirî.

ŞANEK

Di kesê seyim de şikilên »ew çû û wî kirî« û » ew çûn û wan kirî« îro hesêb nayine gotin yanî ev şikil ji kar hatine êxistin. Di kesên seyim de pronavên didowan yanî »wî« û »wan« têne xistin û komek dikevin şiklên jêrîn:

Ew çû, ji xwe re hespek kirî.
Ew çûn, ji xwe re hespek kirîn.

Di vî şikilî de her du pronavên »ew« çi yekejmar çi gelejmar êdî ne pronavine kesîn lê pronavine işarkî ne.

85 Pronava lêkera gerguhêz di pêşiyê de:

Hingê her du lêker bi yek pronavê têne çevandin, bi pronava lêkera gerguhêz.

Min çû ji xwe re hespek kirî.
Te çû ji xwe re hespek kirî.
Wî (wê) çû ji xwe re hespek kirî.

Me çû ji xwe re hespek kirî.
We çû ji xwe re hespek kirî.
Wan çû ji xwe re hespek kirî.

Herwekî di mîsalên jorîn de têtе dîtin, di vî şikilî de lêkera negergu-

hêz jî – wek lêkere gerguhêz – bê dûpaş tête çevandin. Yanî »çûm, çûyî, çû, çûn, çûn, çûn« tev de dibin »çû«. Mirov dikare bibêje qey lêkerên »çûn« û »kirîn« gihane hev û lêkereke hevedidanî wek »çûnkirîn« anîne pê. Û ji ber ko di lêkerên hevedidanî de hikim û îtibar li lêkera paşîn e, û di karê me de lêkera paşîn »kirîn« lêkereke gerguhêz e, lêkera hevedidanî »çûnkirîn« lêkereke gerguhêz hatiye hesêb û welê hatiye çevandin.

Pronavên bireser

86 *min, te, wî, wê, me, we, wan*

Herwekî di mada (77) an de hate gotin ev pronavên ha di eslên xwe de pronavine bireser in: *ez te dibînim, tu min dibînî, em wan dibînin, tu wê dibînî, em we dibînin, hon wî dibînin, ew me dibînin.*

Lê di lêkerên gerguhêz û di zemanên wan ên borî de ev pronav dibin kirar û heke lêkerê bireserekî sererast heye ew bireser bi pronaveke kirar tête guhartin: *min tu dîtî, te ez dîtim, wî em dîtin, wê hon dîtin, me tu dîtî, we ez dîtim, wan em dîtin.*

Lêbelê heke bireserê lêkerê ne sererast, lê nerêrast e; hingê û li gorî qeyda bingehîn pronav weke xwe dimînin; *min ji wan re got, te ji min stand, wî ji wan girt, wê li me da, me bi wan nikarî bû.*

87 *xwe*

Ev pronava nêtar her du mêjer û zayendan jî dinimîne; yanî dikeve şûna mê û nêr, yekejmar û gelejmar: *wî xwe kuşt, wê xwe kuşt, wan xwe kuşt*

Gava di komekê de kirar û bireser ji yek kesî û ji yek mêjerî ne û tevgera kirêr rast bi rast li ser wî bi xwe ye, hingê pronava bireser bi pronava »xwe« tête nimandin. Bi gotinên din pronavên ji yek kes û mêjerî û yeke wan kirar û a din bireser di komekê de nagehin hev. Ji lewre mirov nikare bibêje »ez min di neynikê de dibînim« ji ber ko »ez« û »min« her du jî ji yek kesî û ji yek mêjerî ne; û yeke wan kirar û a din bireser e. Ji ber vê hindê divêt bête gotin: »ez xwe di neynikê de dibînim«.

Lê di komeka: »ez pezê me diçêrînim« de du pronav ji yek kesî û yeke wan kirar û a din bireser gihane hev. Ji ber ko ew herçend ji yek kesî bin jî ne ji yek mêjerî ne; »min« yekejmar û herçî »me« gelejmar e.

Lê ji milê din em dibînin ko di komeka »ez te û birayê te dibînim« de du pronav ji yek kes û mêjerî gihane hev. Ji ber ko her du jî bireser in û di wan de tu kirar nîne.

88 **Awarte:** Pronava »xwe« ya ko di eslê xwe de pronaveke bireser e carina û bi kirarekî dî ve di cihê kirar de têtе dîtin. Herwekî: »Ez û birayê xwe em hatin. Min û birayê xwe me got. Tu û birayên xwe hon ji min re sax bin«.

Di vî halî de mîna ko di mîsalên jorîn de têtе dîtin pronavên ji yek kes û ji yek mêjerî nagehin hev. Lê heke mêjer guhêrî hingê ew digehin hev: *Ez û birayê xwe em hatin. Min û birayên me xwar.*

89 *[y]ê*

Ev pronava nêtar bi tenê yekejmarê dinimîne û dikeve şûna pronavên »vî, vê, wî, wê« yên ko di komekê de pişti lêkerê hatine hildan, herwekî di mîsalên jêrîn de:

Min da vî, vê	Min da ê
Min da wî, wê	Min da ê
Ezê bidim vî, vê	Ezê bidim ê
Ezê bidim wî, wê	Ezê bidim ê

Lê li şûna »min da wan« »min da ê« nayê gotin; ji ber ko pronava »ê« nikare mêjerê gelejmar binimîne.

Pronava berbihevîn

90 *hev, êk*

Pronava berbihevîn ew pronav e ko di qisetê du kesên têvel bi hev re dinimîne û li şûna wan dikeve. Ferqa vê pronavê ji yên din ev e ko pronavên din bi tenê kesekî (kesê pêşîn, kesê diwim an kesê seyim) dinimînin. Herçî pronava berbihevîn divêt du kesan an sê kesan bi hev re binimîne; an ji kesekî çend peyan. Ev pronava ha tucaran nika-

re kesekî bi tenê binimîne. Herwekî li jor tête dîtin ev pronav du şikil hene: *hev* û *êk.* Şikilê paşîn »êk« bi tenê li nîvrorohelatê Kurdistanê de tête gotin.

Me got ko ev pronava ha du an sê kesên têvel dinimîne. Bêdiro, gava em »em birayên hev in« an »em birayên êk in« dibêjin pronava berbihevîn; li gora hazirbûna kesan du an sê kesên têvel dinimîne. Heke yên hazir »ez« û peyakî din e »hev« kesê pêşîn û diwim û heke yên hazir ji du kesan bêtir in, hingê »hev« her sê kesên qisetê dikare binîmîne.

1. Yên hazir »ez« û peyakî din e. Hingê komeka »Em brayên hev in« mana jêrin dide: »Ez brayê te me, tu jî brayê min î«.

2. Yên hazir »ez« û peyayine din in. Hingê komeka »Em brayên hev in« bi awayê jêrîn tête mana kirin: »Ez brayê we me, hon jî (yanî tu û ew) brayên min in«.

Çend mîsalên din. Medhelokê gotiye: »Kalo ji bêkesî, pîrê ji bênefsî her diwan li hev pirsî«. Di vê medhelokê de »hev« ji kesê seyim du mirovan dinimîne: kalo û pîrê. Heke me medhelok ji hev de xist mana jêrîn jê bi der têt: »Wî (kalo) li pîrê pirsî; wê »pirê« jî li kalo pirsî.

Dijminan xar berda hev. Yanî vî aliyî berda wî aliyî û wî aliyî jî berda vî aliyî.

Em du heval in û em ji hev ne razî ne. Yanî ez ji wî ne razî me, ew jî ji min ne razî ye.

ŞANEKA TARÎXÎ

Pronava berbihevîn bi biserveçûna zimên ketiye şikilê xwe ê îro »hev, êk«. Ev pronav di esilê xwe de ji sê bêjeyan bihevketî ye: »hev-û-din« an »êk-û-din«. Ji lewra berê li şûna »em birayên hev in« »em birayên êk in« »em birayên hevûdin in« an »birayên êkûdin in« digotin. Piştre »û« jî ji navê ket û pronav bû »hevdin, êkdin«. Lê birêva di vî şikilî de jî hin tadîl hatine rû. Herwekî: *Hevdi, hevdu, hevdû. Êkdi, êkdu, êkdû.*

Şikilê bingehîn bi temamî winda ne bûye û hetanî îro di hin derên Kurdistanê de weke xwe tête gotin. Ji milê din, ji ber xweşdengiyê, nemaze di zimanê nivîskî de û gava pronavên berbihevîn didin pey hev an ev pronav ketine pêş an paşê bêjeyine yekîte di şikilên kevin de têne istîmal kirin.

Me ji hev re goti bû ko sibe em hev bibînin.
Me ji hev re goti bû ko sibe em hevdû bibînin.
Me hev nas ne kir.
Me hevdû nas ne kir.

Piştî ko em li esilê vê pronavê hûr bûn emê wê ji hev de bêxin û li hêmanên ko ew anîne pê hûr mêze bikin.

Ji xwe di şikilê »êk-û-din« de mana her bêjeyê eşkere ye. Bi tenê tê de »yek« bûye »êk«. Herçî »hev-û-din« gelek heye ko »hev« jî bi mana »yek« e. Bêdiro di zarekî kurdî, di zarê dumilî de ji »yek« re »jew« an »yew« dibêjin.

Pronavên lihevxistî

91 Ev pronavên ha herwekî di mada 76an de hate gotin bi lihevxistina hin daçekan bi hin pronavan hatine pê û li gora pêkhatina komekê ev wan daçek û pronavan dinimînin. Herçî daçek »ji, li, bi, di« ne. Herçî pronav an »vî, vê, wî, wê« ne, an »hev, êk« in. Ji lewre ev pronavên ha du tofan ditînin pê.

92 Tofa pêşîn: *jê, lê, pê, tê*

Min jê stand: min ji vî stand, min ji wî stand, min ji vê stand, min ji wê stand.

Ez jê distînim: ez ji vî distînim, ez ji wî distînim, ez ji vê distînim, ez ji wê distînim.

Min lê pirsî: min li vî pirsî, min li wî pirsî; min li vê pirsî, min li wê pirsî.

Ez lê dipirsim: ez li vî dipirsim, ez li wî dipirsim, ez li vê dipirsim, ez li wê dipirsim.

Min pê karî bû: min bi vî karî bû, min bi wî karî bû, min bi vê karî bû, min bi wê karî bû.

Ez pê dikarim: ez bi vî dikarim, ez bi wî dikarim, ez bi vê dikarim, ez bi wê dikarim.

Min tê da: min di vî da, min di wî da min di vê da min di wê da

Ez tê didim: ez di vî didim, ez di wî didim, ez di vê didim, ez di wê didim.

Herwekî ji mîsalên jorîn ve dixuye ev pronavên ha bi tenê yekejmarê dinimînin û nikarin bikevin şûna gelejmarê. Ji lewre li şûna »min ji wan stand« »min jê stand« nayete gotin.

93 Tofa diwim: *jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk, tev/têk*

Me jev/jêk stand: me ji hev/êk stand.
Me lev/lêk pirsî: me li hev/êk pirsî.
Em lev/lêk dipirsin: em li hev/êk dipirsin.
Me pev/pêk nikarî bû: me bi hev/êk nikarî bû.
Em pev/pêk nikarin: em bi hev/êk nikarin.
Me tev/têk da: me di hev/êk da.
Em tev/têk didin: em di hev/êk didin.

ŞANEK

Ji daçekên ko ji birekî bihevketî ne û dikevin pêşiya bêjeyan (li, bi, ji) tu daçek nikare bikeve pêşiya pronavên lihevxistî. Ji ber ko ev di wê de hene. Ji lewre mirov nikare bibêje; *Mozê bi wî pê veda.* Divêt bibêje: *Mozê bi wî veda.* An: *Mozê pê veda.*

Lê herçî daçekên ko ji du biran bihevketî ne (di ... de, jê ... re, bi ... ve) birê wan ê paşîn dikare bide pey pronavên lihevxistî: *ez tê de bûm, min jê re got, ev her du gund pev ve ne.* Birê van daçekan ê pêşîn ji xwe di wan de ye.

Ji milê din pronavên lihevxistî dikarin bidin pey hev. Ji ber ko di wan de daçekek û pronavek heye û ji lewre gava didin pey hev jî pro-

navek dikeve navbera her du daçekan: *Min jê lê pirsî.* Yanî: *Min ji vî li wî pirsî.*

Pronavên işarkî

94 Pronavên işarkî ji kes tişt û heywanan bi tenê kesên seyim dinimînin û gava dikevin şûna wan, wan bi işaretkirinê şanî didin.

95 Di zimanê kurdmancî de du texlît pronavên işarkî hene:

Ên pîvene: ev, ew
Ên qersene: yê, ya, yên

96 Pronavên işarkî ên pîvene pronavine nêtar in û ji ber ko şikilên wan ên kirar û bireser cihê cihê nînin li gora mêjer û zayendê navdêra ko dinimînin têne tewandin û veqetandekên wan dibin. Ji veqetandekan, bi tenê ên binavkirî bi van ve dibin. Ên nebinavkirî bi van ve nabin. Ji ber ko ev bi işaretkirinê ewçend binavkirî ne ko nikarin bibin nebinavkirî.

Ev

Tiştê nîzing an navdêra ko di qisetê de piştî hemiyan hate gotin şanî dide.

Ev hat	Evî got, evê got, ez evî dibînim, ez evê dibînim.
Ev hatin	Evan got, ez evan dibînim.

Ew

Tiştê dûr an navdêra ko berî çendekê di qisetê de hate gotin şanî dide.

Ew hat	Ewî got, ewê got, ez ewî dibînim, ez ewê dibînim
Ew hatin	Ewan got, ez ewan dibînim.

ŞANEK

Ev pronavên ha di şikilên xwe ên tewandî de, gelek caran bêî »e«-yê têne bi kar xistin:

Vî got, vê got, ez vî dibînim, ez vê dibînim, van got, ez van dibînim. Wî got, wê got, ez wî dibînim, ez wê dibînim, wan got, ez wan dibînim.

Lê neêxistina »e«-yê çêtir e. Ji ber ko gava »e« hate êxistin pronava işarkî »ew« bi pronavên kesîn »wî, wê, wan« tevlî hev dibe.

Yê, ya, yên

97 Pronavên işarkî ên qersene sê pronav in: *yê, ya, yên.* Ev pronav li kes, tişt û heywanan bêî ko dûr an nîzingbûna wan bidin zanîn işaret dikin û di komekê de hergav kirar in û tucaran nabin bireser.

Yê ko hat birayê min bû.
Yên ko hatin birayên min bûn.
Ya ko hat dotmama min bû.
Yên ko hatin dotmamên min bûn.

Herwekî di mîsalên jorîn de têtе dîtin ev pronavên ha tucaran ne bi serê xwe ne û hergav bireserek dide pey wan. Ev bireser jî pronava girêkî »ko« ye.

Ha

98 Ev bêje jî texlîtek pronaveke işarkî ye. Ev pronav dikeve paşiya pronavên işarkî ên pîvene û bi veqetandekê digehe wan û fikira işaretkirinê xurtir dike:

Evê ha	Eva ha	Evên ha
Ewê ha	Ewa ha	Ewên ha

Ji milê din ev pronava ha dide pey navdêran jî û bi veqetandekê bi wan ve dibe.

Mirovê ha	Mirovên ha
Jinika ha	Jinikên ha

ŞANEK

Hin pronavên işarkî, di zmanê devkî de, cih cih ketine şikiline din û esilê xwe winda kirine. Ev tişt bi lihevxistina pronavên işarkî ên pîve-

ne bi pronava »ha« hatiye pê.

Evê ha	Eva ha	Evên ha
vîna	vêna	vêna
Ewê ha	Ewa ha	ewên ha
wîna	wêna	wêna

Di vî şikilî de mê û nêr yanî zayendê bêjeyê dîsan xuya dike. Lê tiştê ko li aliyê roavayê welêt qewimî ye ev ferq jî ji ortê rakiriye û bi tenê ferqa mêjer hiştiye.

Evê ha	Eva ha	Evên ha
vaya	vaya	vana
Ewê ha	Ewa ha	Ewên ha
waya	waya	wana

Nemaze ev şikil bi tu awayî nikare bikeve zmanê nivîskî.

Pronavên girêkî

99 Pronava girêkî dikeve paşiya navdêr an pronaveke din û wan bi komeka ko di pey wan re têt girêdide. Di zimanê kurdmancî de ji bo her du mêjer û zayendan bi tenê yek pronava girêkî heye ew jî »ko« ye.

Pronava »ko« di komekê de, li gora navdêra ko dinimîne carina kirar û carina jî bireser e.

Kirar:	Mirovê ko tu dîtî birayê min e.
	Yê ko tu dîtî birayê min e.
Bireser:	Mirovê ko te dît birayê min e.
	Yê ko te dît birayê min e.

Çend mîsalên din:

Destmalên ko te kirîne spehî ne. Ez îro li hespê ko te dihî ji gund anî, siwar bûm. Çiyayê ko li pêş me ye Herekol e. Mifta ko min pê ev derî vedikir winda bûye.

100 Herwekî di cih û deverê de dê bête gotin di zimanê kurdmancî de ji »ko«-ya pronav pê ve »ko« ke din jî heye. Ew ko gihanek e û wezîfa wê di qisetê de weke din e. »Ko«-ya gihanek dikeve navbera hevokên komekekê û wan digehîne hev. Ji lewre ev »ko« hergav dide pey lêkerekê: *Min got ko ez nayêm. Ew hatin ko me biezimînin.*

Ev ko bi xwe gava bi mana »heke« ye hingê beriya lêkerê têtе gotin: *Ko Lêzgîn hat emê herin nêçîrê.*

Pronavên pirsiyarkî

101 Pronavên pirsiyarkî dikevin komekên pirsiyariyê û li gora pêkhatina komekê, carina kirar û carina jî bireser in.

Kî, kê; çi, çî

102 Ev pronavên ha herwekî têtе dîtin xwediyê du şikilan in, kirar û bireser; ji lewre nayine tewandin.

Kirar	**Bireser**
Kî hat?	Tu kê dibînî?
Çi hat?	Tu çi dibînî? (1)

Pronavên »kî« û »kê« bi gelemperî û bi tenê kesan û pronavên »çi« û »çî« tiştên mayin û carina bi awakî nerêrast kesan jî dinimînin. Ji van pronavan bi tenê »çi« carina veqetandekê dibe.

Ev kî ye?	Ev Hevind e. Ev zarokek e. Ev mirovekî min e.
Tu kê dibînî?	Ez Hevind dibînim. Ez zarokekî dibînim. Ez mirovekî xwe dibînim.
Tu kî yî?	Ez dergevanê dibistanê me.
Ev çi ye?	Ev kitêb e. Ev çiya ye. Ev xapandin e.
Tu jî çi yî?	Ez jî ji xwe re zilamek im.
Ev çiyê te ye?	Ev pismamê min e.

---

(1) Piraniyeke kurdmancan e mezin pronava »çi« de kurt û dirêjbûna »i«-yê derpêş nakin û »çi« û »çî«-yê bi yek awayî bi lêv dikin. Ji lewre her du jî di şikilî »çi« de dikarin bêne nivîsandin.

Çend mîsalên din:

Tu bi kê re hatî? Yê ko hat kî bû? Ez çi jê bikim? Ez pê çi bikim? Kê kî kuşt? Kî kê dikuje? Kê got? Çi dest daye te? Kê dest daye te? Te çi xwar? Tu çi dixwî? Kê karî kê? Kî kare kê? Ev bi çî ye? Te destê xwe daye çi?

Kîjik, kîjan

103 Ev her du pronav mîna hev in, yanî ciyok in û bêferq ji bo kesan û her tiştên din têne gotin û ji ber ko şikilên wan ên kirar û bireser, cihê cihê nînin, wek navdêran û li gora navdêra ko dinimînin têne tewandin.

Kîjik hat?	Tu kîjikî, kîjikê dibînî?
Kîjan hat?	Tu kîjanî, kîjanê dibînî?
Kîjik hatin?	Tu kîjikan dibînî?
Kîjan hatin?	Tu kîjanan dibînî?

Çend mîsalên din:

Kîjanî got? Kîjikan hilgirt? Te ji kîjanê re got? Wê ji kîjikî xwest? Kîjan rabû? Tu li kîjanî siwar bûyî? Kêfa te ji kîjikê re têt?

ŞANEKA TARÎXÎ

Herwekî ji xwe ber dixuye pronavên »kîjik« û »kîjan« bêjeyine hevedidanî ne. Divêt ev ji bêjeyên »kî - ji - van - yek« bihevketî bin. Kurdmancan gava ev bêje lihevxist û jê pronaveke pirsiyarkî anî pê; hinan ji nav van bêjeyan »kî« »ji« û »yek« girtin û ji pronava xwe re şikilê »kîjik«-ê dan. Hinên din li şûna »yek«-ê »an«-a »van«-ê girtin û ji pronava xwe re şikilê »kîjan«-ê dane.

Kî - ji - van - yek	Kîjik
Kî - ji - van - yek	Kîjan

Ji xwe em îro jî dikarin bibêjin; »Tu kê ji van dixwazî«. Lê bi vî şikilî bi tenê mirov têne nimandin.«

Çend

104 Ev pronava ha bi tenê gelejmarê dinimîne: *Ev çend in? Te çend dîtin? Tu çendan dixwazî?*

Ji ber ko ev pronav bi tenê gelejmarê dinimîne, herwekî di mîsalên jorîn de tête dîtin bi tenê bi tewanga gelejmarê tête tewandin. Ev çend bi xwe carina pronava nebinavkirî ye.

Kû

105 Ev pronav bi tenê ji bo pirsiyariya cih tête gotin: *Tu çûyî kû? Ew li kû bû? Hon ji kû tên?*

Pronavên nebinavkirî

106 Pronavên nebinavkirî dikevin şûna navdêrên ko di qisetê de bi awakî mibhem hatine şanî kirin. Bi gotinên din ev pronav wan kes, tişt an heywanan dinimînin ko di qisetê de ne binavkirî ne. Ji ber ko van pronavan şikilekî bi tenê heye, gava ew dibin bireser wek navdêran têne tewandin.

Di zimanê kurdmancî de gelek pronavên nebinavkirî hene û li gora pêkhatina komekê û mehcetê; ji bêjeyine têvel; û ji nû ve hinên din jî têne saz kirin.

Ên bingehîn ev in:

107 **Yek, heryek**

Yek hat. Yekî got. Yekê digote yekî. Ez yekî dibînim. Min ji yekê re got. Heryekê digot. Heryekê dixwend. Yekî din digot. Yeke din digot.

108 **Tu, kes**

Min tu ne dît. Kes ne hat. Kesî ne got. Ez tiwan nabînim. Tiwan ne xwar.

109 **Tukes, tutişt**

Tukesî ne got. Tukes nabêje. Tukes ne hat. Ez tukesî nas nakim. Min ji tukesî re ne got. Tu tişt nîne. Min tutişt ne dît.

110 **Herkes, hertişt, tiştek**

Herkesî digot. Min ji herkesî bihîst. Herkes dibêje. Tiştek ket. Hertişt hazir e. Ji hertiştî bêtir. Tiştek heye. Ez tiştekî dibînim.

111 **Hin, hinek**

Hin hatin. Ez hinan dibînim. Hinan got. Min hin dîtin. Hinek hatin.Hinekan got. Ez hinekan dibînim. Hinên din dibêjin. Hinekên din hene.

Filan, behvan, filankes.

112 Ev pronavên ha dikevin şûna navên mirovan û li gora mêjer û zayendên wan têne tewandin.

Filan hat, behvan ne hat.
Soro hat, Hevind ne hat.

Filanê digot. Mebêje filan û behvan, yek bi yek binav bike. Filankes çire ne hat?

113 Ji van pê ve bêjeyên wek yên jêrîn hene ko gelek caran wek pronavên nebinavkirî têne istîmal kirin: *çend, çendek, hemî, giş, gelek, heçî - h.d...*

Pronavên xwemalîn

114 Pronavên xwemalîn ew pronav in ko li navdêrên ko dikevin şûna wan işaret û fikireke xwemaliyê bi van dikin. Bi gotinên din ev pronav xwediyên tiştên ko di qisetê de qala wan hate kirin şanî didin. Ev pronavên ha ji du pronavên têvel têne pê; ji pronaveke işarkî û ji pronaveke din, bi gelemperî pronaveke kesîn.

Yekejmar

115 Yekejmara vê pronavê li gora zayendê tiştê ko mirov xwediyê wî ye

bi pronavên qersene »yê« û »ya« têtе pê û pronavên din didin pey.

Ên nêr	**Ên mê**
yê min, xwe	ya min, xwe
yê te, xwe	ya te, xwe
yê vî, vê, wî, wê	ya vî, vê, wî, wê
yê me, xwe	ya me, xwe
yê we, xwe	ya we, xwe
yê van, wan	ya va, wan

Gelejmar

116 Gelejmar vê pronavê bi pronava qersene »yên« dest pê dike û pronavên din didin pey.

Gelejmara her du zayendan

yên min, xwe	yên me, xwe
yên te, xwe	yên we, xwe
yên vî, vê, wî, wê	yên van, wan

117 Herwekî têtе dîtin ev pronavên hevedidanî bi her birekî xwe, di qisetê de wezîfeyine têvel dibînin. Birên pêşîn yanî pronavên işarkî ên qersene, şanî wan tiştan dikin ko me qala wan kirine û em xwediyê wan in. Herçî birên paşîn, pronavên ko dane pey wan şanî kes yanî xwediyan didin. Ji ber vê yekê pronavên pêşîn ji mêjer û zayendê tişan û pronavên paşîn ji mêjer û zayendê xwediyan têne bijartin.

destmala min	ya min	destmalên min	yên min
gopalê min	yê min	gopalên min	yên min

Di kesên seyim de pronavên ko xwediyan şanî didin ji zayend û mêjerê pêve dûr û nîzingbûna kesan jî didin zanîn. »vî, vê, van« nîzing »wî, wê, wan« dûr. Herçî xwe kerem bikin fedkirin mada 87.

118 Di zmanê kurdmancî de, ji ên jorîn pêve, hin pronavên din ên xwemalîn hene û têne çêkirin jî. Herwekî: *yê kê, ya tukesî, yên kîjanê, ya hinekan, yê filanan h.d.*

Rengdêr

119 Rengdêr ew bêje ye ko bi navdêrê ve dibe û wesfekî wê dide zanîn; an wê navdêrê di mana wê de tayîn dike û texsîs dike. Herwekî gava em »hespê reş, hespê beza, hespê xurt« dibêjin »reş, beza, xurt« rengdêr in; ji ber ko ew yek bi yek wesfekî navdêra hêsp didin zanîn. Dîsan di gotinên »ev hesp, çar hesp, kîjan hesp, hespê min« de bêjeyên »ev, çar, kîjan, hin, min« rengdêr in; çûnkî ev navdêra hêsp di mana wê ne dîxesisînin û dieyinên.

120 Ji raveka jorîn dixuye ko rengdêr du cisin in: yên ko navdêran diwesifînin û yên ko mana wan tayîn û texsîs dikin. Ji ên pêşîn re rengdêrên wesfîn dibêjin û ew xwerû rengdêr in. Ên mayîn di esilên xwe de bêjeyine din in û gava di komekê de bi navdêrê ve dibin, wezîfa rengdêrê dibînin û navdêrên xwe li gora tewangên xwe didin tewandin û gava navdêr ji komekê dikevin û ew bi serên xwe dimînin hingê vedigerin esilên xwe.

121 Di nav navdêran de bi tenê ên wesfîn yên ko xwerû rengdêr û ji bêjeyên neguhêrbar in; gava bi tena xwe jî dimînin nayine tewandin û veqetandekê jî nabin. Lê herwekî di cih û devera wê de dê bête ravekirin vê qeydê jî awarteyin hene.

122 Di zmanê kurdmancî de şeş texlît rengdêr hene:

1. Rengdêrên wesfîn
2. Rengdêrên işarkî
3. Rengdêrên jmarîn
4. Rengdêrên pirsiyarkî
5. Rengdêrên nebinavkirî
6. Rengdêrên xwemalîn

123 Ji van rengdêran, ên wesfîn dikevin paşiya navdêran û bi du awan bi wan ve didin. Ên xwemalîn hergav didin pey navdêrê û veqetandek dikeve navbera wan. Herçî işarkî, pirsiyarkî û ên nebinavkirî dikevin pêşiya navdêran û bêî tu tiştî bi wan ve dibin. Ên jmarîn, hinek ji wan dikevin pêşî û hinekên din paşiya navdêran.

Rengdêrên wesfîn

124 Rengdêrên wesfîn gava bi navdêran ve dibin wesfekî wan didin zanîn, ango wan diwesifînin.

Wekî niho, bêjeyên »reş, spehî, bilind« rengdêrine wesifîn in; ji ber ko gava bi navdêran ve dibin wesfekî wan didin zanîn. Herwekî: »Min hespê reş dît. Ev hespê ha reş e. Ez li ber gola spehî rûniştî me. Bi min ev gol spehî ye. Felemêz hilkişiya bû ser vê dara bilind. Ev dar gelek bilind e«. Mîna ko ji van mîsalan dixuye rengdêrên wesfîn di komekê de pişti navdêrên xwe peyda dibin û bi du awayên têvel bi wan têne girêdan.

1. Bi veqetandekê: tifinga qenc, şeşderba dagirtî, mehîneke boz, xanîkî nizim, mêrekî baş, mirovine xirab, jinine spehî, destmaleke sor, çêleka doşe. Hingê rengdêr bireserê navdêrê ye.

2. Bi lêkera bûnê: ev tifing qenc e, ew xanî nizim e, şeşderb ne dagirtî ye, hespê min beza ye, mehîna ko hate avis e. Hingê rengdêr pêveberê lêkera bûnê ye.

125 Rengdêrên wesfîn li gora bastûrên xwe an sade an hevedidanî ne. Ên sade ew in ko di zimên de şiklekî wan î sabit heye û ji bêjeke bi tenê têne pê. Wek: *sor, girtî, niviz, qels, xurt, şikestî, weza, dirêj, kurt, fireh, pehin, bilind, teng h.d.*

Ên hevedidanî ew in ko ji bêjeyên têvel têne pê. Ev rengdêrên ha di zimanê kurdmancî de bê pîvan in û di dema xeberdan an nivîsandinê de hinên din, ji nû ve têne saz kirin. Mîna: *pozberan, çavbelek, diltenik, xweşcivat, nûza, dilşikestî, kêmxew, sorboz, warxweş, destvala h.d.*

126 Bi gelemperî rengdêrên wesfîn di komekê de bi navdêrên xwe peyda dibin. Lê gava navdêrên wan ne bi wan re ne, yanî ew ji komekê ketine, hingê navdêr bi veqetandekên ko rengdêr bi wan ve dibûn têne nimandin. Herwekî di madeyên (64, 68)an de hate gotin veqetandek dikeve pêşiya rengdêrê û wêzîfa pronavê dibîne. Heke di qisetê de, ji berê de, çêl li hêsp û mehînê hati be kirin, hingê mirov li şûna ko

bibêje: »ez hespê boz dibînim« an »ez mehîna boz dibînim« dikare bibêje: »ez ê reş dibînim« û » ez a reş dibînim«

127 Lê carina navdêr ji qisetê yekcar dikeve û rengdêr wek pronavekê li şûna wê radibe. Hingê rengdêr, ji ber ko wezîfa navdêrê dibîne û wesfê xwe ê rengdêrîn winda dike, wek navdêrê têtе tewandin û veqetandek bi paşiya wê ve dibe.

Stranê gotiye:

Tirsim bimrim ne bînim esmera min
Riya Mêrdînê bi kaş e, delala min.

Bêjeyên »esmer« û »delal« herdu jî rengdêr in. Lê ji ber ko li hire bûne navdêr û şanî jin an keçikekê didin veqetandeka mê bi van ve bûye. Heke me malikê stranê vegerandin esilên wan, hingê navdêr vedigerin şûnên xwe û rengdêr bi serên xwe û bê veqetandek dimînin:

Tirsim bimrim ne bînim yara min a esmer
Riya Mêrdînê bi kaş e, yara min a delal.

Dereceyên rengdêrên wesfîn

128 Rengdêrên wesfîn, wesfên navdêran bi dereceyên têvel dikarin bidin zanîn. Bi gotinên din ev rengdêrên ha di qisetê de ji awirê mana û bastûrê ve di şikiline têvel de têne dîtin. Wekî niho gava mirov dixwaze wesfê bezabûna hespekî bide zanîn dikare bibêje:

1. Ev hesp beza ye.
2. Ev hesp (ji ê din) bezatir e.

Di komeka pêşîn de rengdêra *beza,* wesfê navdêra hêsp gava ev bi tena xwe û bezabûna wî adetî ye, ne kêm û ne jî zêde ye, dide zanîn. Di vî halî de rengdêr di halê adetî de ye.

Herçî komeka diwim, tê de rengdêra *beza* di şikilekî din de ye û »tir«-ek pê ve bûye. Bi vê »tir«-ê rengdêr dikeve halê kemper, yanî miqayesê. Belê gava em »Ev hesp bezatir e dibêjin; hespê ha hatiye dayîn

ber hespekî din û ji ê din bezatir derketiye. Ji lewre parkîta »tir«-ê bêî ko nevdêra rengdêrê bi navdêreke din bête kemperandin yanî miqayese kirin, bi rengdêrê ve nabe.

QEYDE

Ji bo çêkirina kemperiya dengdêran li rengdêrên adetî »tir«-ekê zêde dikin. Herwekî: *qenc/qenctir, bilind/bilintir, spehî/spehîtir, sor/sortir, dirêj/dirêjtir, fireh/firehtir, xurt/xurtir, beza/bezatir h.d.*

129 Ji milê din rengdêrên wesfîn di halên xwe ên adetî û kemper de bi zêde kirina hin pirsan, nemaze hokeran di mana xwe de kêm û zêde dikin.

1.
Ev hesp beza ye.
Ev hesp hinek beza ye.
Ev hesp gelek beza ye.
Ev hesp yekcar beza ye.
Ev hesp ne ewçend beza ye.
Ev hesp bi qasî hev beza ne.
2.
Ev hesp (ji ê din) bezatir e.
Ev hesp (ji ê din) hinek bezatir e.
Ev hesp (ji ê din) gelek bezatir e.
Ev hesp (ji ê din) yekcar bezatir e.
Ev hesp (ji ê din) ne ewçend bezatir e.
Ev hesp ji hev ne bezatir in.

130 Dîsan ji aliyê din rengdêrên wesfîn ên adetî gava »ne«-yek dikeve pêşiya wan bi awakî din mana dibin û dikevin şikilê nerênî. Herwekî dagirtî-nedagirtî. *Ev tifing dagirtî ye. Ev tifing nedagirtî ye.*

Lê heke »ne« bi rengdêrê ve ne bûye hingê rengdêr ne nerênî ye. Bi rastî gava em »ev tifing nedagirtî ye« dibêjin jê mexsed ew e ko tifing vala ye. Lê heke me »ev tifing ne dagirtî ye« dibêjin jê mexsed ew e ko tifing hêj nehatiye dagirtin. Yanî nerênî ji rengdêrê bêtir li lêkerê hikim dike.

Rengdêrên işarkî

131 Ev rengdêrên ha dikevin pêşiya navdêran û li wan işaret dikin. Rengdêrên işarkî ji pronavên işarkî ên pîvene »ev, ew« pêve, ne tu tişt in û gava navdêrên wan ji komekê dikevin ew vedigerin ser eslên xwe û wezîfeyên xwe ên bingehîn dibînin; herwekî di mîsalên jêrîn de têtе dîtin:

Ev mirov îro ji bajêr hat.
Ev îro ji bajêr hat.
Ewî mirovê ko tu dîtî birayê min e.
Ewê ko tu dîtî birayê min e.
Evan mirovan gote min ko tu çûyî nêçîrê.
Evan gote min ko tu çûyî nêçîrê.

132 Me di mada 57an de goti bû ko navdêrên nêr bi guhartina »a« û »e«-ya wan bi »ê«-kê jî têne tewandin û di hin derên Kurdistanê de ev navdêr gava yekejmar in yekcar nayine tewandin. Lê heke rengdêreke işarkî daye ber navdêrê hingê navdêr ji kîjan mêjer û zayendî be jî li gora qeyda gelemper têtе tewandin. Ji lewra mirov nikare bibêje »Ez vî hêsp, an, vî hesp dibînim« divêt bibêje »Ez vî hespî dibînim«. Herwekî: *vî hespî / van hespan | wî hespî / wan hespan | vê mehînê / van mehînan | wê mehînê / wan mehînan.*

133 Gava çend navdêr didin pey hev, herwekî mirov dikare her navdêrê bi rengdêra xwe a işarkî şanî bide, li gora zayend û mêjerê navdêran, dikare bi yek rengdêra işarkî jî bes bike.(1)

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek zayendî, lê ji yek mêjerî ne û her du jî yekejmar in. Rengdêra işarkî ji zayendê navdêra paşîn e û bi tenê navdêra paşîn têtе tewandin.

Vê tîrê û vî kevanî bide min.
an: Vî tîr û kevanî bide min.

---

(1) Kerem bikin fedkirin mada 58an.

Tu vî hespî û vê mehînê dibînî?
an: Tu vê hesp û mehînê dibînî?

Tu vê mihê û vî beranî dibînî?
an: Tu vî mih û beranî dibînî?

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek mêjerî ne. Her navdêr bi rengdêra xwe tête nîşan kirin û yek nikare bikeve cihê a din û li şûna wê rabe.

Tu vî hespî û van mehînan dibînî?
Tu vê mihê û van beranan dibînî?

Rengdêrên jmarîn

134 Rengdêrên jmarîn ji hin jmarnavan pêve ne tutişt in û gava bi navdêran ve dibin an mêjer û mixdar an rêza wan didin zanîn. Ji vî awirî ve ev rengdêrên ha du celeb in: *jmarîn* û *rêzîn.*

135 Ên jmarîn dikevin pêşiya navdêran û mêjer an mixdarê wan didin zanîn û navdêrên xwe li gora tewangên xwe didin tewandin: *Deh mirov hatin. Deh mirovan got. Çel mirov hatin. Çel mirovî got. Çel û pênc mirov hatin. Çel û pênc mirovan got. Min deh rîtil goşt kirîn. Ezê deh rîtil goşt bikirim. Ezê deh rîtilan bikirim. Ezê çel rîtilî bikirim. Ezê deh rîtil û nîv pirtiqal bikirim. Ezê deh û nîvan bikirim. Tu ji vî sed xaniyî kîjanî diecibînî?*

136 Ên rêzîn dikevin paşiya navdêran û rêza wan di qisetê de didin zanîn. Ev rengdêrên ko wek ên wesfîn didin pey navdêran gava navdêrên wan ji qisetê dikevin veqetandekên wan li şûnê radibin: *Ji hire heta stûna çaran bijmêrîne û li ber wê bisekine. Ev e şagirtê çaran, ê heftan li kû ye? Mehîna min di bezê de a pêncan derket. Di vê rêzê de siwarê sisiyan birayê min, ê şeşan pismamê min e. Min ev kitêb heta rûpelê wê bist û çaran xwend.*

ŞANEK

Jmarnavên »dido« û »sisê« gava dikevin pêşiya navdêrekê û dibin rengdêr ji »dido« kîta paşîn û ji »sisê« kîta pêşîn dikevin û ev her du

jmarnav dibin »du« û »sê«

Du mirov hatin.	Du mirovan xwar.
Sê mirov hatin.	Sê mirovan xwar.

Rengdêrên pirsiyarkî

137 Hin pronavên pirsyarkî gava dikevin pêşiya navdêran dibin rengdêr û ji wan re rengdêrên pirsiyarkî dibêjin. Ev rengdêr bi tenê di komekên pirsiyariyê de têne dîtin. *Kîjan mirov hat? Tu kîjan mirovî dibînî? Kîjan jinikê got? Kîjan mirov hatin? Çend mirovan xwar? Tu çend mirovan dibînî? Ev çi tişt e? Tu çi tiştî dixwazî? Tu ji çi kesî yî? Tu çûyî kû derê?*

Rengdêrên nebinavkirî

138 Rengdêrên nebinavkirî dikevin pêşiya navdêran û wan nebinavkirî dikin. Di zimanê kurdmancî de gelek rengdêrên nebinavkirî hene. Yên ko ji hemiyan bêtir têne bi kar êxistin ev in: *tu, her, herçî, filan, gelek, hemî, hevqas, çend. h.p.*

Hemî mirovan digot. Îsal gelek fêkî hene. Min jê re tu derman peyda ne kir. Kêm û zêde her kêr dibire. Min îro filan jinik dît. Ji terşê me çend kavir mirine. Li cem min hevqas pere hene. Herçî mêrên qenc bi bêbextiyê tola xwe venakin.

Rengdêrên xwemalîn

139 Rengdêrên xwemalîn ji hin pronavên kesîn û hin pronavên işarkî têne pê; dikevin paşiya navdêran û xwediyê kes, tişt an heywanên ko qala wan di qisetê de tête kirin didin zanîn. Ev rengdêr birê pronavên xwedin ên paşîn bi xwe ne; û li şûna ko bidin paşiya pronavên qersene (yê, ya, yên) rast bi rast dane pey navdêran.

min, xwe	me, xwe
te, xwe	we, xwe
vî, vê, wî, wê, xwe	van, wan, xwe

Ev rengdêrên ha û navdêrên wan bi veqetandekê digehin hev. Veqetandek jî li gora mêjerê zayenda navdêrê tête bijartin.

Hespê min, mehînên te, kitêba vî, qelemên wê, xaniyê me, çiyayê we, kurên van, keça wan.

140 Lê heke navdêrên van rengdêran bi awakî ji qisetê ketine, hingê li gora mêjer û zayenda navdêrê yek ji pronavên qersene ên işarkî vedigere şûnê û rengdêr dibe pronaveke xwemalîn. Herwekî gava em »Ev rasteka min e, kanî ya te« dibêjin mexsed »Ev rasteka min e, kanî rasteka te« ye. Ji bo kurtî û spehîtiyê em bêjeya »rastek« dubare nakin.

Çend mîsalên din: Min destmala xwe peyda kir, te jî ya xwe dît. Kitêba min ji ya te stûrtir e. Erdê wan avî ye; lê yê me bejî ye. Ew çû hespê xwe anî; tu jî here yê xwe bîne.

ŞANEK

Heke rengdêrên xwemalîn tev de ji yek mêjerî ne hingê mirov dikare kurtebir bike û bibêje: »Hespê min û te anîn« Li şûna ko bibêje »Hespê min û hespê te anîn« an »Hespê min û yê te anîn«.

Jmarnav

141 Jmarnav ew bêje ne ko mêjer an mixdarê tiştan, bi awayên têvel didin zanîn û di qisetê de bi navdarekê ve dibin an dikevin şûna wê; wê dinimînin û lê vedigirin.

142 Jmarnav mêjer û mixdaran an yekcar binavkirî dikin û wan welê didin zanîn, an bêî ko wan tayîn bikin, wan bi awakî mibhem pêş me dikin. Ji vî awirî ve jmarnav du celeb in:

1. Jmarnavên binavkirî: çar, ê çaran, çaryek, ji çaran yek, ê çarim.

2. Jmarnavên nebinavkirî: gelek, hindik, pir, bêtir, zehf h.p.

Jmarnavên binavkirî

143 Jmarnavên binavkirî jî di nav xwe de bi çar biran leva dibin:

1. Jmarnavên bingehîn
2. Jmarnavên rêzîn
3. Jmarnavên birewîn
4. Jmarnavên komelîn

144 Herçî jmarnavên adetî ji yekê heta dawiyê tev de jmarnavên bingehîn in û jmarnavên mayîn tev de ji van têne der.

145 Jmarnav ji ber bastûra xwe ve an sade an hevedidanî ne.

Ên sade ew in ko ji hejmareke bi tenê hatine pê: *çar şeş, yanzdeh, bîst, hezar, mîlyon h.p.*

Ên hevedidanî ew in ko ji yekê bêtir hejmaran hatine pê. Ev hejmarên ha bi gihaneka »û« bi hev têne girêdan: *bîst û çar, sed û bîst, neh, hezar û neh sed û çil û yek, şeş hezar û pênc sed û çil û heşt, du mîlyon û sed hezar û pênc, sed û neh.* Herwekî ji mîsalên jorîn dixuye herçî yekînekên wek *sed, hezar, mîlyon h.p.* gava dubare, sêbare... dibin navbe-

ra wan û navbera hejmara ko wan daye pey hevgihamka »û« nakeve: *sê sed, deh hezar, panzdeh mîlyon, çil û pênc mîlyon h.p.*

Tewanga jmarnavan

143 Jmarnav ji ber ko ji bêjeyên guhêrbar in, gava di qisetê de dibin bireser, têne tewandin û navdêrên ko didin pêşiya wan didin tewandin.

Qeyda gelemper

147 Di tewangê de esil jmarnavê sade ye. Ji lewre di jmarnavên hevedidanî de tewang li goreyî hejmara paşîn tête çêkirin.

Û gava ev jmarnav dikevin pêşiya navdêran, navdêr jî tewanga hejmara paşîn dibin û pê ditewin.

Ez çaran dibînim. Ez çar hespan dibînim.
Ez sihî dibînim. Ez sih hespî dibînim.
Ez sih û çaran dibînim.
Ez sih û çar hespan dibînim.

Emê li jêr, tewanga jmarnavan, bi rêzê ve, digel xweseriya her hejmarê, yeko yeko û kom bi kom bibêjin.

Nîv

148 Gava ev jmarnav bi serê xwe ye û bi tiştekî din ve ne girêdayî ye bi »î«-yê tête tewandin: *nîvî bide min, nîvekî bide min, bi nîvî bike.*

Lê heke jmarnaveke din an navdêrek bi nîvî ve bûye hingê »nîv« li goreyî tewanga wan tête tewandin û ji ber ko hikim li wan nake her navdêr bi tewanga xwe a xweser ditewe.

Ji yek û nîvê (nîvan) bêtir.
Ji çar û nîvan bêtir.
Ji çil û nîvî bêtir.
Nîv zebeşî (zebeşekî) bide min.
Nîv sêvê (sêvekê) bide min.
Bîst û nîv zebeşi (zebeşekî) bide min.

Bist zebeş û nîvan bide min.
Bîst û nîv sêvê (sêvekê) bide min.
Bîst sêv û nîvan bide min.
Zebeş û nîvî (nîvekî) bide min.
Sêv û nîvê (nîvekê) bide min.
Min ev hesp bi bîst zêr û nîvekî kirî.
Min ev hesp bi bîst zêr û nîvan kirî.
Min ev hesp bi çel zêr û nîvî kirî.
Bi goştê nîv bizinê em têr nabin.

Yek

149 Ev jmarnava ha bi »ê«-yê tête tewandin: *Ji yekê, bîst û yekê, çel û yekê, sed û yekê, hezar û yekê, mîlyon û yekê...*

Lê gava »yek« dikeve pêşiya navdêrekê lê hikim nake û zayendê xwe nadiyê. Ji lewre navdêr li goreyî tewanga xwe ditewe: *Ji yek hespî, yek mehînê, bîst û yek zebeşî (bîst û zebeşekî) bîst û yek sêvê (bîst û sêvekê).*

Çend mîsalên din: Min ji hezar û yekê bêtir hesp hene. Ez sed û yek hespî û hezar û yek çêlekê dibînim. Ji bîst û yekê heta sê sed û yekê bijmêrîne. Min ev hesp bi çil û yek zêrrî (bi çil û zêrekî) kirî. Min bîst beranên xwe bi sih û yek bizinê (bi sih û bizinekê) guhart. Birayê min ev xanî bi sed û zêrekî (bi sed û yek zêrî) firot.

150 Jmarnavên *dido, sisê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yanzdeh, dwanzdeh, sêzdeh, çardeh, panzdeh, şanzdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bîst,* bi »an«-ê têne tewandin: *Ji çaran, heştan, dehan, bîstan; bîst û pêncan, sed û nehan, sê sed û heftan, hezar û şanzdehan, hezar û çil û siseyan... bêtir.*

Ev jmarnavên ha tewangên xwe didin navdêrên xwe û wan jî wek xwe ditewînin: *bi şeş zêran, ji heft bizinan, di nav hevdeh keçikan de, bi çel û heşt eskeran ve, ji du sed û nozdeh çêlekan, ji hezar û heştê û çar hespan.*

151 Jmarnavên *sih, çil, pêncî, şêst, hefitê, heştê, not, sed* bi »î«-yê têne tewandin: *ji çilî, şêstî, notî, sedî, pênc sedî, neh sedî, sed û çilî, hezar û du sedî,*

heft hezar û heşt sedî, çar mîlyon û sedî... bêtir.

Ev jmarnavên ha jî tewanga xwe didin navdêrên xwe û wan jî wek xwe ditewînin: *bi sih zêrî, ji çil bizinî, di nav heftê keçikî de, bi not eskerî ve, ji sed û pêncî çêlekî...*

Hezar

152 Ev jmarnav jî gava bi serê xwe ye bi »î«-yê têtе tewandin û hikim li navdêra xwe jî dike.

Ji hezarî, ji yek hezarî, ji hezarekî bêtir.
Ez hezar hespî dibînim, ez hezar mehînî dibînim.

Lê gava hezar bi jmarnaveke din ve bûye dikeve bin hikimê wê û li gora tewanga wê hejmarê têtе tewandin: *ji çar hezaran, bîst hezaran, çel hezarî, çel û pênc hezaran, sed hezarî, sed û deh hezaran... bêtir.*

Ji milê din jmarnava hezar gava ne bi serê xwe ye û daye pey jmarnaveke din navdêra xwe nema dikare bitewîne. *Min ev tişt bi hezar zêrî, çar hezar zêr, çel hezar zêr, çel û pênc hezar zêr, sed û deh hezar zêr kirî.*

III. Servehî

ARIF ZÊREVAN

Trajediya tirkîfîzebûyiyan û minaqeşeya li ser »i« û »î«-ya kurdiyê

Di taliya sala 1996-ê de pirtûka Celadet Çelîkerî ya di heqê hinek pirsên elfabeya kurdiyê de der ket. Herçend di pirtûkê de hinek agahdarî di heqê dîroka elfabeya kurdiyê de hebin jî, kitêb pirtir li ser herfên kurdiyê »i« û »î«-yê ye.

Celadet Çelîker bi navê »zanahiyê« parêzkarên elfabeya kurdiyê mat dike û herwiha bi navê zanahiyê guhortina herfên kurdiyê »i« û »î«-yê dixwaze.

Di vê nivîsarê de ez dê yek bi yek li ser argûmentên parêzkar û hevrikên van du herfên kurdiyê rawestim û bidim diyar kirin ka Celadet Çelîker çawa bi navê zanahiyê destdirêjiyê li zanahiyê dike û ka ew çawa bêbextiyan li Celadet Alî Bedir-Xanî dike.

Argûmentên Celadet Alî Bedir-Xanî ji bo nivîsandina du dengên kurdiyê bi »i« û »î«-yê pir eşkere ne. Argûmenta wî ya ewilî tenê (denganiya kurdiyê) bi serê xwe têra wê yekê dike ko mirov van herfan wekî tirkan nenivîsîne.

Lê belê hevrikên elfabeya kurdiyê di minaqeşeyan de pirê caran ji argûmenta denganiyê pirtir li ser argûmenta windabûna »i«-ya bêniqte li kêleka hinek herfan disekinin û dibêjin argûmenta Celadet Alî Bedir-Xanî hingê di cihê xwe de bit jî, piştî ko tirkan dest ji nîşandeka berî »i«-ya bêniqte berdayîn ew argûment hêdî ne di cihê xwe de ye.

Denganiya zimanê kurdî

Ka em ewilî behsa denganiya zimanê kurdî û van du herfan bikin. Delîlên Celadet Alî Bedir-Xanî hêjayî hezarbarekirinê ne û ew wiha dinivîsîne:

Lê herwekî me berê jî goti bû, di dengayiya kurdî de, dengdêrek carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in drêjên wan nîne û herçî drêj in kinên wan peyda nabin.

Ber vê yekê dengdêra »e« herçend bête drêj kirin ticar nabit »ê« ji ber

ko cihderkên wan ji hev cida ne. Herwekî »i« jî bi drêjxwendinê nabit »î«.

Di destê me de ti herfên din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em bi herfên hevduanî emel mekin. Ji lewra ji bona nîşankirina tofa paşîn me ev »^« nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabêyên din de dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguhêrîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguhêrîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêj in û ticar kin nayên xwendin.

[– – –]

Jê pê ve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zimanan cida ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketiye.

Celadet Alî Bedir-Xan di benda ewilî ya destûrên elfabeya kurdiyê de jî behsa denganiyê dike û denganiyê ji nîzîkkirina bo tirkiyê girîngtir dibîne:

Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzîk xistin û jê nedûrketin. [reşkirina min, Arif]

Wekî ko dixwehî Celadet Alî Bedir-Xanî nîşandeka bilindekê »^« ji bo sê dengdêrên kurdiyê (ê, î, û) çêkiriye û ev nîşandek wan dengan bilind dide xwendin. Ev bilindek ne ji bo »î«-yê tenê ye. Bilindek wekhevî û istiqrarekê di van dengdêrên bibilindek de çêdike. Ko yek ji van bête guhortin divêt yên dî jî bên guhortin. Ta niho jî min fêm nekiriye ka çima hevrikên elfabeya kurdiyê minaqeşeya bilindeka li ser »î«-yê dikin. Heger minaqeşe bibit divêt ne li ser »î«-yê, lê tenê li ser hûreka herfa »i«-yê bêt kirin. Hûreka herfa kurdiyê »i« û herfa tirkiyê »i« di şiklê xwe de wekî hev in. Ne kurdek û ne jî tirkek nikare »î«-ya kurdiyê »xelet« fêm bike.

Cihderka »î«-ya kurdiyê ji »i«-ya tirkiyê cida ye û dengê herfê jî ne wekî ya tirkîyê ye.

Hemî kes li ser vê hemfikir in. Hevrikên elfabeya kurdiyê dibêjin erê em vê qebûl dikin, lê ma ne em in yên dengan li herfan bar dikin.

Ew jî rast e, lê belê cardî jî mirov nikare (i) û (î)-ya kurdiyê bike wekî yên tirkiyê. Çima? Lewra heger mirov van herdu herfan bike wekî yên tirkiyê hingê dê piraniya kurdên bakurê wan wekî yên tirkiyê bi lêv (telefiz) bikin. Şona bibêjin »kirin« dê bibêjin »kırın«. Hemî kes dizane çiqes ferq di nêvbera »kirin=yapmak« û »kırın=bişikênin« de heye. Nimûneyeka pir balkêş di vî warî de filîmê *Mem û Zînê* ye; yê ko li Tirkiyeyê hatibû kişandin û ji aliyê kurdên tirkîzan ve hatibû duble kirin bo kurdiyê. Gava mirov guhdariya diyalogan û dengên kesên di filîmî de diaxivin dike, mirov dibêje qey ew bi tirkiyê diaxivin.

Yê ko bixwaze vê rastiyê fêm bike bila teksteka bi kurdî bi »ı« û »i«-ya tirkiyê binivîse û bide yekê tirk ko bi dengê bilind jê re bixwîne. Hingê ew dê bibihîse ka yê tirk van dengan çawa bi lêv dike.

Windabûna »i«-ya bêniqte û prosesa xwendinê

Celadet Alî Bedir-Xan wiha dinivîsîne:

Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêk anî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkan dûr mekevin.

Li hire, di herfên »i« û »î« de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk[an] »i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte nîşan kirin. Heke me welê bikira û »i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte û ya drêj bi »i«-ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko »i« ke bê niqte di nav herfên »u, n, m« û di pêş- û paşê hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona veqetandina »i«-ke bê niqte ji herfên jorîn – ko ketiye rex an nava wan – ser herfa ko berî »i«-yê dihat işaretek berdidan.

Bêşik e ko me nikarî bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin.

Wekî min berê jî got, hevrikên elfabeya kurdiyê di minaqeşeyan de pirê caran li ser windabûna »i«-ya bêniqte li kêleka hinek herfan disekinin û dibêjin argûmenta Celadet Alî Bedir-Xanî hingê di cihê xwe de bit jî, piştî ko tirkan dest ji nîşandeka berî »i«-ya bêniqte berdayîn ew problem hêdî nemaye.

Rast e tirkan nîşandeka berî »i«-ya bêniqte rakirine, lê belê problem bi xwe her maye. Problem çi ye? Li gor lêkolînên hatîn kirin gava ko mirov tekstekê dixwîne mirov ne herfan lê resimê bêjeyan nas dike û dixwîne. Wextê ko Celadet Alî Bedir-Xan behsa windabûna »i«-ya bêniqte di nêv hinek herfan de dike ew biheq e. Ji ber ko bi nimûneyeka pir hêsanî jî mirov dikare isbat bike ko ka çawa »i«-ya bêniqte xwendinê zehmet dike.

Ez nıkarım hın nımûneyan bıdım te.
Ez dê lingê wi bışıkênım. Ez hıngi dıbêjım.
Serê xwe bılınd bıkın û alayê hıldın!
Ez nikarim hin nimûneyan bidim te.
Ez dê lingê wî bişikênim. Ez hingî dibêjim.
Serê xwe bilind bikin û alayê hildin!

Di nimûneya ewilî de çav bi hêsanî nikare nas bike ka di bêjeya »nikarimê« de herfa li pey »a«-yê têt »n« ye an »r« ye.

Celadet Çelîkerî di kitêba xwe de behsa prosesa xwendinê kiriye lê belê qet behsa ka çav çi dibînin û mejî çawa tiştên ko çav dibînin zeft dike nekiriye. Heger ko wî kitêbek li ser prosesa xwendinê xwendibe divêt hayê wî ji vê agahdariyê hebe, heger ne em dikarin bibêjin ko ew bi zanîn rastiyê vedişêre da idiaya xwe ya bêbingeh biparêze.

Ka em hinekê bi teoriyên prosesa xwendinê ve mijûl bibin. Du teoriyên cida di heqê prosesa xwendinê de hene: *teoriya bîevyorîst* û *teoriya kognîtîf.*

1. Teoriya bîevyorîst atomîk e û dibêje ko mirov ewilî »beşan« paşê »giştê« dibîne. Ji aliyê pedagojîk ve encamên vê teoriyê bi »rastxwendina« tekstê tên pîvan, ne bi »rastfêmkirina« tekstê. Yek ji xeterên vê teoriyê ew e ko mirov dikare tekstekê rast bixwîne bêyî ko ti tiştê jê fêm bike. Ev teorî heta destpêka salên 50-yê raser (domînant) bû. Herfa tirkiyê »ı« ji ber ko di nêv bêjeyan de winda dibe nahêle ko mirov bêjeyan rast bixwîne.

2. Teoriya kognîtîf lê dikole ka mirov çawa enformasyonê zeft dike û bi kar tîne, ka mirov çawa vê enformasyonê vediguhorîne dike

zanîn û di hafizeya xwe de qeyd dike û herwiha ka mirov vê zanînê çawa ji bo idarekirina reftarên xwe bi kar tîne.

Nêrîna vê teoriyê nêrîneka holîstîk (giştî) ye. Li gor vê nêrînê mirov ji »giştê« ber bi beşan ve diçe: hevok, bêje, kît û fonem (deng) û careka dî vegera li »giştê«. Ji aliyê pedagojîk ve başiyên vê teoriyê pir in: xwendevan tekstê xweştir fêm dike, motîvasyona xwendinê li nik xwendevanan pirtir dibe, baweriya xwendevanan bi wan xurttir dibe û hw.d.

Li gor teoriya kognîtîf sê hafize ji bo xwendinê têne bi kar anîn:

a) Hafizeya îkonîk. Ev hafizeya he di demekê gelek kurt de – di nêvbera 200 û 500 milîsaniyeyan de – dikare drûvên resimê tekstekê zeft bike û ji lewra jê re »hafizeya resimî« dibêjin. Karê vê hafizeyê ew e ko resimê bêjeyê di serê mirovî de biparêze ta ko mirov pê re bigihît ko herfan nas bike.

b) Hafizeya demê kurt. Navekê dî yê vê hafizeyê »hafizeya karî« ye, ji ber karê wê bikaranîna nêveroka enformasyona di tekstê de û guhortina enformasyonê bi hafizeya demê dirêj re ye, da ko em nêveroka fikra tekstê fêm bikin.

c) Hafizeya demê dirêj. Karê vê hafizeyê yê bingehî ew e ko wê enformasyona ko ji bo jinûvenaskirina herf û bêjeyan lazim e, qeyd bike. Demê vê hafizeyê gelek dirêj e.



Niqteya li ser »i«-ya kurdiyê welê dike ko mirov resimê bêjeyên ko »i« tê de hene zûtir nas dike û li xwendinê nalikûme. Herwiha li gor lêkolînan mirov tekstekê çiqes zû bixwîne ewqes pirtir jê fêm dike. Rakirina niqteya li ser »i«-ya kurdiyê dê hem xwendinê dereng bêxe hem jî fêmkirinê kêmtir bike.

xwen-din	tempo bêje/deq.	hejmara yên rast	hejmara yên xelet	hejmara seregavkiriyan	hejmara pirsan
1.	200	21	13	6	40
2.	400	25	9	6	40
3.	800	34	3	3	40

Ev tablo ji kitêba Åke W. Edfeldt »Lästeknikê« hatiye girtin. Rûper 46.

Dengdêrên kurt »i« û »e« bi hev re bingehên dengdêrên kurt yên kurdiyê pêk tînin. Dengdêra »u« wekî Celadet Alî Bedir-Xanî gotiye dengek biyanî ye ko ji »w« û »i«-yê çêbûye. Ji xwe ew »u« di kurdiyê de kêm têt bi kar anîn.

Bi rastî jî ji aliyê prosesa xwendinê ve bikaranîna »i«-ya bêniqte dê katastrofek bit ko divêt mirov ticaran wê belayê neîne serê xwe.

Li gor lêkolînan mejî dikare di saniyeyekê de şeş yan heft »parçeyan« nas bike. Ev parçe dikarin herf, bêje an jî ji bêjeyekê dirêjtir bin. Hafizeya demê kurt wan parçeyan vediguhêze bo hafizeya demê dirêj û şeş yan heft parçeyên dî nas dike. Baş e, heger ko welê bit diyar e kes nikare di deqîqeyekê de ji 420 herfan pirtir bixwîne û ev jî katastrofek e ji bo xwendinê. Lê belê dilê xwe li xwe neşewitînin, lewra mejî di saniyeyekê de dikare şeş yan heft bêjeyan jî nas bike û hingê tempoya xwendinê di deqîqeyekê de dibit 420 bêje. Lê belê em dizanin ko mejî dikare di saniyeyekê de şeş yan heft »parçeyên« ji bêjeyekê dirêjtir jî nas bike. Û bi vî awayî mejiyê mirovekî dikare di deqîqeyekê de 800 bêjeyan nas bike. Zûxwendina tekstekê bi zûnaskirina bêje û parçeyên ji bêjeyan dirêjtir ve girêdayî ye.

Heger ko em bi »1«-ya bêniqte rabin resimê bêjeyan xirab bikin û welê bikin ko xwendevan serê xwe bi herfan ve biêşîne hingê em dê tempoya xwendinê pir kêm bikin û welê bikin ko xwendevan ji xwendinê hem sar bibe hem jî teksta ko dixwîne baş fêm neke.

Xeletiya Çelîkerî ew e ko ew dihesibîne ko çav ewilî herfan û paşê bêjeyan dibîne. Wekî li jorê jî hat nivîsandin çav resimê bêjeyê berî herfê dibîne. Piştî ko çav resmê bêjeyê dibîne mejî wî resimî rave dike û herfan nas dike. Lê belê di xwendineka normal de piştî ko mejî resmê bêjeyekê nas dike resimî wekî parçeyeka pêkvegirêdayî dihesibîne û lê naxebite ko nas bike ka kîj herf di wê bêjeyê de hebûn.

Hêsanî an zehmet

Argûmentek ya hevrikên elfabeya kurdiyê ew e ko kurdên bakurê Kurdistanê ji ber ko elfabeya zimanê tirkî dizanin dê bi hêsanî bikarin kurdiyê bixwînin heger ko em »i« û »î«-ya xwe bikin wekî yên tirkan.

Ev argûment bêbingeh e; ji ber guhortina van du herfan (i, î) bi yên tirkiyê (ı, i) otomatîkmen rastxwendina dengên herdu herfên kurdiyê bi xwe re naîne. Heger ko em van herdu herfan bikin wekî yên tirkan dê kurdên tirkîaxêv û kurdên di bin tehsîra zimanê tirkî de mayîn dengên van herdu herfan ne li gor denganiya kurdiyê lê li gor denganiya tirkiyê bi lêv bikin û bêjeya »kirin«-ê ko bi maneya »yapmak«-a tirkiyê ye dê bikin »kırın« ko bi tirkiyê maneya wê »bişikênin« e.

Yanî her çi dibit bila bibit divêt dersdêrên kurdiyê xwendekaran fêrî dengên kurdiyê bikin. Heger em »i«-ya xwe bêniqte binivîsînin divêt em xwendekarên kurd li bakurê Kurdistanê fêr bikin ko dengê wê herfê ji ya tirkan bilindtir bi lêv bikin. Herwiha herger em »î«-ya xwe bi »i«-yeka biniqte binivîsînin divêt em xwendekaran fêr bikin ko ew wê ji ya tirkan bilindtir bi lêv bikin.

Ji ber ko di prosesa xwendinê de bêjeyên ko di hafizeya demê dirêj de kom bûyîn roleka giring dilehîzin qet feydeyê dibistanên tirkan ji zûxwendina bi kurdî re nîne. Gava mirov tekstekê bi kurdî dixwîne mirov dikare resmê bêjeyên wê bide ber resmê bêjeyên zimanê kurdî, ne yên zimanê tirkî. Heger di hafizeya mirovî de resmên 100 hezar bêjeyên zimanê tirkî hebin jî feydeyê wan ji xwendina bi zimanê kurdî re nîne.

Hevrikên elfabeya kurdiyê gelek caran dibêjin ko Celadet Alî Bedir-Xan bi nivîsandina »i« û »î«-yê ji »i«-ya adetî bi dûr ketiye. Divêt mirov ji van hevrikan bipirse ka »i«-ya adetî çi ye.

Carekê divêt bêt gotin ko di latîniyê bi xwe de »i« bi sê şiklan têt nivîsandin. Di latîniyê de dengê »i«-ya kurt bi kevanekeka berê wê li jor, wekî nîşandeka li ser »ğ«-ya tirkiyê, nîşan dikin. Bêjeya »criticus« bi rakirina niqteya li ser herdu »i«-yan û danîna kevanekeka wekî ya li ser »ğ«-ya tirkiyê têt nivîsandin. Herwiha di latîniyê de dengdêrên dirêj bi danîna xêzekê li ser herfê tên nivîsandin. Wekî: »invītāmentum«. Vêca »i«-ya adetî çi ye? Heger ko hevrik difikirin ko »i«-ya adetî di zimanên ko bi elfabeya latînî dinivîsînin de hertim dengê »î«-ya

kurdiyê dide, ne rast e. Lewra di ingiliziyê de »i«-ya adetî carinan »î«-yek kurt e, carinan »ay« e û carinan jî dibe »ö«. Yanî ingilîz bêjeya »pile«-yê wekî »payl« bi lêv dikin û bêjeya »first«-ê jî wekî »först« bi lêv dikin. Heger ko em li gor mantiqa Celadet Çelîkerî bifikirin divêt em bêjeya kurdiyê »pîle«-yê wekî »pile« binivîsînin. Pir diyar e zarokên kurdan yên ko li Ingiltereyê mezin bûne dê bêjeya »pile«-yê ne wekî »hîle« lê wekî bêjeyeka ingilîzî fêm bikin û wekî »payl« bi lêv bikin. Di zimanê ingilîzî de maneyên »pile«-yê gelek in. Yek ji wan »hirî« ye, yeka dî »tilm, gir« e û yeka dî »baterî« ye.

Di fransiyê de jî »i« hertim dengê »i«-yê nade. Bo nimûne bêjeya »international« wekî »enternasyonal« têt bi lêv kirin. Yanî »i«-ya ewilî dibit »e« û ya piştî »t«-yê jî digel »o« û »t«-yê du dengên dî çêdikin.

Mebesta min bi van ravek û nimûneyan ew e ko divêt em elfabeya xwe ne li gor ka kurd li kîj welatî dijîn çêkin. Ya girîn denganiya kurdiyê ye û denganî jî bi fêrkirinê têt zanîn, ne bi nivîsandina wekî tirkan.

Ji ber ko tirkan »i«-ya bêniqte bi kar anîne û dengê wê ji yê »i«-ya me cida ye divêt em wekî wan nekin. Wekîtirkannekirin bi serê xwe argûmentek têra xwe xurt e ji bo ko em ya xwe biparêzin.

Jixwe wekî ko min di benda didoyê de jî got rakirina niqteyê ji aliyê xwendinê ve jî dê tenê zererê bide me.

Celadet Çelîker di kitêba xwe de dibêje »bi danîna bilindeka li ser »î«-yê mîr Celadet ji çend destûrên xwe bi dûr dikeve«. Ev idiaya Çelîkerî ne rast e. Heger Celadet Alî Bedir-Xanî wekî tirkan kiribûya dê ji destûra xwe bi dûr biketa. Destûra Celadet Alî Bedir-Xanî ya ko bi van herfan ve girêdayî ye ev e:

Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzîk xistin û jê nedûrketin. [reşkirina min, Arif]

Yanî denganiya zimanê kurdî berî hertiştê ye.

Celadet Çelîker di kitêba xwe de ne tenê bi navê zanahiyê bêbextiyê li zanahiyê dike herwiha ew bêbextiyan li Celadet Alî Bedir-Xanî jî dike gava ko ew holê dinivîsîne:

Gava tîpa »i«-ya bêbilindek, xwendin û nivîsandina kurdiyê ji bo kur-

dên bakurê Kurdistanê hêsanîtir bike, ev tişteka qenc e û bi dilê Mîr Celadetî bi xwe ye jî. (Çelîker, Celadet, (1996), *Çend pirsên elfabeya kurdî,* rûp. 75) [Min zimanê Çelîkerî serast kiriye, Arif]

Celadet Alî Bedir-Xanî ji sala 1932-ê ta sala 1943-ê »Hawar« bi elfabeya kurdiyê nivîsî û tenê guhortinek tê de çêkir. Ew jî guhortina herfa »q«-yê bi »k«-yê ye. Ew ji bo tesbîtkirina deng û herfan gelek bi sexbîr bû. Ji bo tesbîtkirina herfa »k«-yê wî bêjeya »krîstal« li pênc kesên cida bi xetê erebî da nivîsandin. Wî herfa kurdiyê »ş« wekî ya tirkan nivîsî û heger wî xwestibûya û rast dîtibûya dê herfên kurdiyê »i« û »î« jî bikirina wekî yên tirkiyê. Yanî Çelîker bêbextiyê li Celadet Alî Bedir-Xanî dike.

Font, Internet û teknîk

Heçî ji aliyê teknîkî ve ye têra xwe sebeb hene ko em wekî tirkan nekin. Di wan destxetên (fontên) ko ji zimanên ewropî re – yên slawî ne tê de – hatine çêkirin de herfên kurdiyê (ç, Ç), (ê, Ê), (i, I), (î, Î), (û, Û) hene lêbelê (ş, Ş) nînin. Di van fontan de herfên tirkiyê (ı, İ), (ğ, Ğ) û (ş, Ş) nînin.

Ji bo kurdiyê girdek û hûreka herfa »ş«-yê nînin, lê belê ji bo tirkiyê girdek û hûrekên sê herfan (ı, İ), (ğ, Ğ) û (ş, Ş) nînin.

Di komûnîkasyona nêvneteweyî de – nemaze ya bi riya Internetê – îro problemeka mezin ji tirkan re derketiye. Hinek ji wan dest pê kirine ko »i«-yên bêniqte jî bi »i«-ya biniqte dinivîsînin, herfa »ğ«-yê bi »g«-yê dinivîsînin û herfa »ş«-yê jî bi »s«-yê dinivîsînin. Li jêrê dê du nimûneyan ji du tekstên bi zimanê tirkî ko di Internetê de çap bûne binivîsînim:

Susurluk kazas‡n‡n ard‡ndan ortaya ç‡kan devlet - mafya - aşiretler aras‡ndaki »karanl‡k ilişkiler yuma› ‡na« J†TEM elemanlar‡n‡n ad‡n‡n kar‡şmas‡ Türk Silahl‡ Kuvvetleri'nde büyük rahats‡zl‡k yaratt‡. (Milliyet, 21-ê sibata 1997-ê)

Cumhurbaskani Süleyman Demirel, Türkiye'nin 73 yilda giderek ilerleyen, büyüyen çagdas bir devlet oldugunu belirterek, "Bu ülkede çöker miyiz, yikilir miyiz, köktenci mi oluruz diye kaygiya kapilmaya gerek yoktur. Hassasiyeti anliyorum, ama kaygiyi anlamiyorum" dedi.

Türkiye Yardimsevenler Dernegi'nin 69. kurulus yildönümü dolayisiyla düzenlenen törende konusan Cumhurbaskani Demirel, "Bulundugumuz günlerde tartismalar yapiliyor ve bu tartismalarin çogu bilgisizce, öfkeyle yapiliyor. Saniyorum ki, birbirimizi anlamaya çalisirsak, birbirimizi daha iyi anlariz, daha az kirariz" dedi. (Ajansa Anadoluyê, 19-ê sibata 1997-ê)

Têbînî: Celadet Çelîker di kitêba xwe de gelek caran bi maneya »zanahiyê« bêjeyên »zanist« û »zanyariyê« bi kar tîne. Bi ya min ew van bêjeyan istismar dike.

Celadet Çelîker dibêje »i«-ya kurdî û »i«-ya tirkî ne malê babê kurdan û tirkan in. Ew bi latînî ne. Lê bila Çelîker ji bîr neke ko ew ne malê babê ewropiyan e jî, lewra orjîna elfabeya latînî elfabeya fenîkiyan e.

Serkanî:

1. Bedir-Xan, Celadet Alî (1932–1943) »Hawar«, Şam, Çapxana Tereqî
2. Edfeldt, Åke W. (1956) »Lästeknik«, Stockholm, K F:s Bokförlag
3. Gaur, Albertine (1992) »A History of Writing«, London, The British Library
4. Smith, Frank (1986) »Läsning«, Stockholm, Almqvist & Wiksell
5. Åkerblom, Hans (1988) »Läsinlärning – från teori till praktik«, Stockholm, Almqvist & Wiksell
6. Çelîker, Celadet (1996) »Çend pirsên Alfabeya Kurdî«, Stockholm, Weşanên Roja Nû